

Bi avabûna Komara Kurdistanê

XEBATA GELÊ KURD PÊVAJOYEK MODERN Û PÊŞKEVTÎ BÎ XWE VE GIRT

Semînarek Ji Bo Nirxandina 100'mîn...



2

Awirek Ji Dîrokê



4

Gelî Hevalan ! Eger Hûn Çûn...




5

Hevpeyvîn Bi Berpirsê CAPK'ê Re...



7

HUNER



9



► 63 salan berî niha rêber û bijardeên civaka Kurd li Rojhilatê Kurdistanê ku 3 salan berê Komeleya Vejdandina Kurd ava kiribûn, piştê jî yekemîn partiya nojen li ser bingeh û rêbazên demokratîk (Partiya Demokrat a Kurdistanê) damezrandin, bi mifahwergirtin ji vê derfet û delîveya ku piştî şerê duyemîn yê cihanî di herêmê de hatibû holê, xewna mezin a avakirina hikûmeteke neteweyî a Kurdî bicî anîn û Komara Demokratîk a Kurdistanê bi rêberiya Pêşewa Qazî Mihemed hate avakirin. Çalakiyên di vê derbarê de di Paşkoya taybet a vê hejmarê Agirî (104) de bixwînin...

Givîna Komîteya Navendî Ya PDKÎ, Piştevanî Ji Hikûmeta Herêma Kurdistanê Bi Erkeke Nîştimanî Dizane

► Pêncemîn civîna Komîteya Navendî a PDKÎ piştî 3 rojan dawî bi xebatên xwe anî. Di daxuyaniya Deftera Siyasî a PDKÎ bi vê hencetê de, serhêla bas û helwestên siyasî ên vê partiye der barê Hikûmeta Herêma Kurdistanê, şerê Hamas û Îsrailê, pîrsa mafê mirovan li Îran û Kurdistanê, rewşa aborî a Îranê û her wiha biryarên rêxistinî û rêvebirina PDKÎ hatine rohnkirin.

Deqa daxuyaniya Deftera Siyasî a PDKÎ bi hilkevta dawîhatina pêncemîn civîna Komîteya Navendî a PDKÎ bi vi awayî ye:

Hevwelatîyên hêja!

Xelkê xweragir yê Kurdistanê! Alîgir û endamên PDKÎ!

Komîteya Navendî a PDKÎ, seet 9'ê sibêdeya roja yekşem, 25.01.2009'an, pêncemîn civîna xwe bi beşdariya pîrraniya herî zaf a endamên eslî û Cihgirên Komîteya Navendî lidar xist.

Civîna bi ragehandina deqîqeyek bêdengî bona rêzgirtin ji canê paqij ê Şehîdan dest pê kir.

Di destpêkê de, destûra karê civînê ku berê endamên rêberiya partiye jê hatibûn haydarkirin, herwiha bas li ser bernameya dema kar û xebatên civînê hate kirin û bi zêdekirina çend beşên din ji bo destûra karê civînê, hate pejirandin.

Dom di Rûpela 3'an de...



Semînarek Ji Bo Nirxandina 100'mîn Hejmara Agirî û 500'mîn Hejmara KURDISTAN'ê Hate Lidarxistin

Kurdistanmedia - Agirî: Bi henceta çap û belavbûna 100'mîn hejmara duheftînameya Agirî û

500'mîn hejmara Rojnameya KURDISTAN'ê, Komîsyona Çapemenî ya PDKÎ, roja pêncşem, 15.10.2009'an, semînareke berfireh bi dirûşma 'KURDISTAN û Agirî şabala peyveke kesk in', di hola giştî a rê û resmên Partiya Demokrat a Kurdistanê de lidar xist.

Di vê semînarê de, Sekreterê Giştî yê PDKÎ, endamên Deftera Siyasî, hejmerek ji endamên rêberî, Kadro û Pêşmergekên PDKÎ û malbatên wan beşdar bûn.

Semînar bi xwendina sirûda neteweyî a 'Ey Reqîb' û deqîqeyek bêdenî bona rêzgirtin ji canê paqij yê Şehîdên rêya azadiya Kurdistanê dest pê kir.

Piştê rêzdar Mistefa Hicrî, Sekreterê Giştî yê PDKÎ bi axavtina xwe semînar vekir. Birêz Hicrî di destpêka axavtina xwe de bal kişande ser dîroka 63 sal xebata Rojnameya KURDISTAN'ê û bi hûrî basa asteng û pirsgerêkên ser rêya xebatên Rojnameya KURDISTAN'ê di bin desthilatdariya rejîma Paşatî ya berê û rejîma Komara Îslamî a Îranê kir. Di beşeke din a axavtina xwe de, Birêz Hicrî basa rola KURDISTAN'ê di xizmet bi ziman û wêjeya Kurdî kir û xebatên wê di vê derbarê de bilind nixand. Mistefa Hicrî bi germî pîrozbahî û destxweşî ji Kadro û Pêşmergekên Komîsyona Çapemenî a PDKÎ kir ku xebatên çapemenî ên partiyên bi berdeyamî dimeşînin.

Piştê Sekreterê Giştî ê PDKÎ, Mistefa Hicrî qala hewcehiya weşandina duheftînameya Agirî kir û bal kişande ser vê yekê ku nêzik 70 ji sedê a xelkê Kurd li her çar parçeyên Kurdistanê bi zaravê Kurmançî dipeyivin û bi tîpên latînî dixwînin û dinivîsînin, lewra pêwîstî bi belavokê hebû ku doza gelê Kurd li Rojhilatê Kurdistanê ji hemû aliyên ve rabeghîne Kurdên Kurmançaxiv ên her çar parçeyên Kurdistanê.

Wî bi germî pîrozbahî û spasiya xebatkarên Agirî jî kir û hêviya serkevtin û berdeyamî di xebata wan de xwest.

Li pey re, Erfan Rehnimûn, Endamê Komîteya Navendî ya PDKÎ û berpirsiyarê Komîsyona Çapemenî a PDKÎ axavtinek kir. Wî di destpêka axavtina xwe de spas û pêzanîna hemû wan kesan kir ku di KURDISTAN'ê û Agirî de heta niha xebitîne, nemaze rêzdar Ferhad Ekberî ku zêdetirî 8 salên vê dawiyê şev û roja di Rojnameya KURDISTAN'ê de kar û xizmet dikir.

Piştê birêz Rehnimûn bal kişande ser mijar û gotarên ku di heyamê 63 salên borî de bi ser rojnameya KURDISTAN'ê de bal bûye û bi hûrî û berfirehî ew gotar û ziman û taybetmendiyên wan qonaxan şîrove kir.

Di beşeke din a axavtina xwe de, Rehnimûn bal kişande ser xebat û çalakiyên Komîsyona Çapemenî a PDKÎ weke



derkirina rojnameyên KURDISTAN bi du zimanên Kurdiya Soranî û zimanê Farsî, belavkirina duheftînameya Agirî û weşana 'Dinyay Mindalan' (Çihana Zarokan) û malpera kurdistanmedia. com'ê. bi du zaravên zimanê Kurdî û zimanê Farsî û hwd...

Piştî axavtina Erfan Rehnimûn, civîna yekem a nirxandina Rojnameya KURDISTAN'ê pêk hat û endamên dîwanê, rêzdar, Têmur Mistefayî, Rostem Cehangîrî û Kawe Behramî bûn.

Di wê beşa semînarê de 5 gotar hatin pêşkêşkirin: 1. 'Kurdistan di nava rojnamevaniya armançxwaz û rojnamegeriya baw de' ji aliyê Riza Fethulanejad, 2. 'Gotara KURDISTAN' di qonaxên cur bi cur de' ji aliyê Hesên Selîmî, 3. 'rol û bandora rojnameya KURDISTAN'ê di piroşsa nasnameya neteweyî de' ji aliyê Arîf Nadrî, 4. 'KURDISTAN pîrek di navbera neteweyên Îranê de' ji aliyê Selam Îsmâîlpûr û 5. 'Dinyay Mindalan, projeyek ji bo pêşerojê geş' ji aliyê Fatîh Salihî ve hatin xwendin.

Di beşeke din a karê Semînara 'KURDISTAN û Agirî şabala peyveke kesk in' de, Koma Hunerî a Zarokên 'Diyay Mindalan' sirûda 'Ey Kurdistan' xwendin û bi germî ji aliyê beşdarên ve hate pêşwazîkirin. Xelata rêzgirtin a Deftera Siyasî a PDKÎ ji aliyê Sekreterê Giştî yê PDKÎ, birêz Mistefa Hicrî pêşkêşî Kek Erfan Rehnimûn, berpirsiyarê Komîsyona Çapemenî û ji aliyê Mihemednezîf Qadirî, endamê Polîtbiroyê ve jî xelata han pêşkêşî Azad Kurdî, berpirsê Duheftînameya Agirî hate kirin.

Piştî bêhnvedaneke kurt, beşa din a karê semînarê dest pê kir. Dîwana civîna duyem, ji aliyê rêzdar Kerîm Perwîzî, Çeko Rehmî û Mihemedsalih Qadirî ve hate rêvebirin.

Di destpêka vê beşê de, Azad Kurdî, berpirsê Duheftînameya Agirî axavtinek kir û bal kişande ser sedem û hewcehiyên avakirin û weşandina Agirî bi zaravê Kurmançî û tîpên latînî.

Azad Kurdî bi hûrî bas ji armançên ku Agirî li ser bingeha wan dest bi xebatê kir û niha jî her dom dike.

Wî di doma axavtina xwe de bal kişande ser hinek taybetmendiyên xebata Agirî di warê xizmet bi rojnamevaniya Kurdî, ximzet bi nûkirin, pêşdebirina zimanê Kurdî, bi taybet zaravê Kurmançî û çand û kultûra Kurdan.

Dûre birêz Mihemedsalih Qadirî wekî yek ji damezrênerên Agirî axavtinek balkêş kir û bi hûrî basa rola Agirî di warê xebatên rojnamevanî û pêşdebirina ziman û wêjeya Kuemancî a zimanê Kurdî kir.

Qadirî Agirî weke destkevteke girîng û dîrokî ya PDKÎ da zanîn û Agirî weke pira navbera Rojhilatê Kurdistanê û Kurdên Kurmançaxiv ên beşên din ên Kurdistanê hesaband.

Piştê Selîm Zencîrî, gotarek balkêş di bin navê 'Agirî, temenek kurt, xizmeteke berbiçav' li ser destkevtên duheftînameya Agirî pêşkêş kir.

Herwiha gotara Mecîd Heqî, rojnamevan û pisporê ragihandinê di bin navê 'Agirî, pêngaveke nû di rojnamevaniya Kurdî de' ji aliyê Dara Natiq ve hate xwendin.

Endamên Dîwana nirxandinê ên vê beşê jî, nêrîn û têdîtinên xwe li ser her yek ji wan gotaran anîn rojevê.

Di navbera beşên cuda-cuda ên semînarê de, çend helbest ji aliyê pêşkêşkara semînarê, Nahîd Husênî ve hatin pêşkêşkirin.

Semînar 3 seetan dom kir.

Doma 'Daxuyaniya Dawîhatina Pêncemîn Civîna Komîteya Navendî Ya PDKÎ Dawî Hat' Ji Rûpela 1

Piştire, birêz **Mistefa Hicrî**, Sekreterê Giştî yê PDKÎ şîroveyek siyasî derheq guhartinên dawîn ên navbera civîna çarem û pêncem ku rewşa giştî a cîhan, herêma Rojhilata Navîn û Kurdistanê û karûbarê hundir yê partiyê li xwe girtibû, pêşkêşî beşdarên civînê kir.

Beşdarên civînê gellek çelengane di derheqê hemû basan de, dîtin û nêrinên xwe diyar kirin û bi têdîtinên xwe, analîz û şîroveya han dewlemendtir kirin.

Di şîroveya Sekreterê Giştî de, qala hîlbijartinên vê dawiyê ên Serok Komariya Amerîkayê û hîlbijartina Barack Obama bo Serok Komariya Amerîkayê hatibû kirin. Di vê derheqê de, civîn li ser vê bawerê bû, ew hîlbijartin û hîlbijêrane bi hemû taybetmendiyên xwe ve, bi liberçavgiştina wan pirsgrîrêk û arîşeyên weke kirîz û qeyrana aborî, bêkarî, pîrsa Îraq, Efxanistan, xebat li dijî terorîzmê û pirsgrîrêkên navçeyî ku li hember îdareya nû a Amerîkayê de ne, guhartineke bîngêhî di siyaseta giştî û derve a Amerîkayê de ku di çarçoveya stratejîk a Amerîka û ew jî li ser binêşa berjewendiyên wî welatî ava bûye, pêk nahê. Lê taktîk û awayên gihîştin bi wan armanca bi curekê tîn destnîşankirin ku gotûbêj rola berbiçavtir bilîze û pêwendiyên navbera Amerîka bi Çîn, Rûsya û Yekîtiya Ewropayê re aram bike û di karûbarê navneteweyî û çareserkirina pêrsgrîrêkan de, zêdetir wan beşdar bike û di vê derbarê de hevkarîyeke berbiçavtir bîne rojevê.

Civîna Komîteya Navendî a PDKÎ, kombûna welatên 5+1 ku vê carê bi beşdariya serokên çend welatên Erebi ên xwedî bandor, li "New York"ê hate lidarxistin, bi hewl û bizavê bona munzewî û terîkxistina rejîma Komara Îslamî û hevdegiya beşek ji welatên Erebi tevî welatên 5+1 û Rojavayîyan bi giştî hesaband.

Civînê di çarçoveya basa siyasî a têkildar bi Rojhilata Navîn de, îşare bi rewşa Îraqê kir û li ser vê bawerê bû ku zext û givaşên welatên cîran ên wî welatî bo ser hikûmeta Îraqê bi armanca berteskkirina cihpê û pêgeha Kurd di desthilata navendî de û kêmkirina êxtiyaratên Hikûmeta Herêma Kurdistanê, bi ron û zelalî tê sehkirin û her eva jî bû sedema nakokî û dijheviya navbera hikûmeta navendî û Hikûmeta Herêma Kurdistanê. Di rewşeke wisa de, civînê erk û wezîfeya hêzên demokrat û welatparêz zanî ku piştigiriyê ji îstîqar û parastina destkevîten demokratîk ên Îraqa Federal û piştevanî ji Hikûmeta Herêma Kurdistanê bikin bona pêkhatin û desteberbûna xwestek û daxwazên demokratîk ên gelê Kurd di wî parçeyî de û çareserkirina pirsgrîrêkên Bexda û Herêma Kurdistanê ji rêya gotûbêj û pêwendîbûn bi qanûna bîngêhî a wî welatî.

Pilînomê şerê vê dawiyê ê Hamas û Îsrailê xiste rojevê, di vê derheqê de civînê xem û keserên xwe ji bo xesarên mirovî û ziyarên malî ên wî şerî da xuyakirin û piştigiriyê xwe ji hewl û cehdên diplomatîk bi armanca gihîştin bi aştiyeke berdewam û adilane diyar kir, aştiyek ku bikaribe mewcûdiyet û tenahiya Îsrailê û desthilata serbixwe a Filistinîyan ewle û garantî bike û ji vê rêyê ve belêgirtin ji maytêkirin û destwerdana welatên têkder ên weke Komara Îslamî a Îranê bihê kirin.

Civînê lînehîrînek li ser helwesta Turkiyê ji bo danîna televîzyona TRT6 û belavkirina bernameyan bi zimanê Kurdî û herwiha rêdan ji bo xwendina çend kurs dersên Kurdî di di zanîngêhên wî welatî de kir û di vê derbarê de civîna Komîteya Navendî a PDKÎ li ser vê baweriyê bû ku ew kare li hember xwestek û daxwaziyên

gelê Kurd li Turkiyê, tiştêk biçûk e, lê li gora siyaseta berê a Turkiyê ku înkâr û haşakirin ji hebûna Kurd di wî welatî de bû, gawe ber bi pêşveçûnê ye. Civînê hêvîdar e ku ew gave destpêkiye bibe sedema dabînbûna mafên neteweyî ên Kurda li Turkiyê.

Civîn di basa derbarê Îranê de, bi liberçavgiştina pêvejaoya bûyeran, ew rastî destnîşan kirin ku siyaseta serkut û çewisandin û kiryarên dijî mirovî ên rejîmê her doma siyasat û kirinên berê ne, bi vê cudahiye ku pêvajoyê hejmarê îdaman ber bi zêdebûnê ye, girtin û îşkencekirina xwendekar, rewşenbîr û azadîxwazan berfirehtir û eşkere û bêperdetir dimeşe. Saziye berewanîkerên mafê mirovan û yek ji wan bîroya 'Kanûna Parêzerên Berevenaker ên Mafê Mirovan' ya Şîrîn Ebadî, hatine daxistin û tîrsa girtin, gefxwarin û binçavkirinê li ser çalakên mafê mirovan heye. Heke ew rewş di hemû Îranê de di holê de ye, li Kurdistanê bi tundî û dijwariyeke zêdetir û bi awayekî berfirehtir dimeşe û vê dawiyê jî hate dîtin ku Rojanmeyên 'Rojhelat' û 'Aştî' rastî girtinê hatin.

Di derheqê rewşa aborî a Îranê de, civînê qala xirab û şepirzebûna jiyana xelkê, bêkarî û betalî û kêmdahatî û destkurtiya xelkê kir û pêsîdîna wê yekê kir ku rewşa jiyân û debara xelkê di pêşerojê de ber bi xirabiyê biçe û berevajî gotinên Ehedînejad ku li ser vê bawerê ye kirîza aborî a cîhanê, Îranê nagire û egera vê yekê bi radeya sifirê dizane, rewşa aborîya welat berev şepirzeyiyeke zêdetir diçe, nemeza bi dabezîna buhaya neftê weke dahata sereke a Îranê.

Siyaseta Besicgirtinê ku Komara Îslamî bi berfirehî û bi awayekî tevalî bi haydan û gefxwarin û heta neçarkirina xelkê rêve dibe, baseke din a civîna pêncem a Komîteya Navendî a PDKÎ bû, beşdarên civînê ew siyasat û kiriyara rejîma Îranê bi kompo û pîlandanîneke din li dijî azadîxwazên Îranê a serkut û tepeserkirina bêtir a tevgera azadîxwaziya Kurdistanê zanî û her di wê demê de jî ew yek bi nigeraniya rejîmê bi pêşeroja xwe hesaband. Pîlînom li ser vê bawerê bû ku her çend ceribinan daye holê ku ew cure pîlanane di rewşa hesas de, nikarin rejîmê ji wê çarenivîsê derbaz bikin ku çavniheriya wê dike, daxwazê ji civatên xelkê Kurdistanê dike ku li hember wan komployan Komara Îslamî li ser hest bin û rê nedin hejmarek her çend kêr jî li keç û xortên Kurd, bi soz û qewlên rejîmê bixapin û bibin dar û destekên dijmin ji bo serkutkirin Kurda û tevgera berheq a wî.

Di beşeke din a karê xwe de, civînê galaleyê ayînname(destûr û rêbaza karkirinê)ya pêşniyarkirî a Komîsyonan xiste berbas û bi têdîtin û destwerdanê ve hatin pejirandin. Her di wê çarçoveyê de pêdeçûn bi ser ayînnameya pileya Kadroyên siyasî û leşkerî hate kirin û guhartinên hewce tê de pêk anî. Di beşa dawî a karê pêncemîn civîna Komîteya Navendî a PDKÎ de, hîlbijartina endamên Cihgir û Ravêjkarên Komîteya Navendî li derveyî welêt birêve çû.

Civînê piştî encamdana erkên xwe, seet 17'ê êvarîya roja sêşem, 27'ê Çileya Paşîn a 2009'an dawî bi karên xwe anî.

Partiya Demokrat ya Kurdistanê Îranê
Deftera Siyasî
27.01.2009
08.11.1387

Mafê Mirovan

Nivîsîn: Peter R. Baehr *
Wergeran: Mecîd Heqî



Rola Mafê Mirovan Di Siyaseta Dereve De

Destpêk

Mafên însan, mafên mirov, an mafên bîngêhî ev nav in ku bi wan mafên bîngêhî hatine dayîn yên ku mafên destpêkî yên ku ji bo pêşveçûna

takekesan bi wacib û hewce hatine zanîn. Bi vî awayî *Mafê mirov û Siyaseta dereve* dest pê dike, ku di sala 1979'an de ji aliyê Wezaretê Dereve ya Holandayê hatibû weşandin. Bi gotina wê yekê Wezîr (Dereve) bi awayekî cihê destxweşiyê dîtinên xwe li ser mijarê şîrove kir; ew asoya rêzgirtin ji mafê *takekes* rohn dike.

Di wê destpêkê de ez dê çend mijarên ku wek mafê mirovan tîn dîtin û pêwendiya wan bi siyaseta dereve re heye, şîrove bikim. Mebesta min ewa nine ku ez lêkolînek berfireh û kûr derbarê hemû mijaran û pênasayan bikim. Gellek ji wan pênasayan wek lêkolînanê Amerîkî dibêjin hişk û vala ne. Nimûna jêr dê wê pîrsê baştir şîrove bike: Filozofê ramyarî "Maurice Granston" mafê mirovan wek "tiştêk ku herdem bi hemû mirovahiyê ve girêdayî be, pênasê dike. ewra ewa nabe bi wateya wan mafane bê dîtin ên ku em bîdest tînin an jî ên ku ji rêya pesendkirina yasayan hatine bîdestveanîn; mafê mirov nayên kirin û firotin û ne jî ji aliyê kesekî taybet ve hatine afirandin ne jî peymanek e ku ji aliyê kesekî ve hatibe pêşkêşkirin... Ew mafên mirovan in, ji ber ku mirov însan e." Siyasetzanê Australiyayî "Hedley Bull" mafê mirovan bi vî awayî şîrove dike: "Ev mafên ku bi mirov wek xwe girêdayî ne, nek mafê wê an wî tex û çîn (tebeqe) ji mirovan. Ev diviya ji bo hemû mirovahiyê bin. Ev diviya tenê bi awayekî yeksan ji bo hemû mirovan be". Ji bo merema me ew hinde bes e ku em bibêjin mijar girêdayî bi mafê hemû mirovan e – ew mafên ku bi xwe xwediyê statuyekê ne. Ew mafên ku giringtir ji mafên din in. Ji ber wê ewana bi mafê mirovan an mafên mirovahiyê tîn naskirin.

Mafê mirovan di siyaseta dereveyî de xwediyê cîhek taybet yê xwe ye. Hin armancên tiradîsyon (kevneşop) ên siyaseta dereve wek parastina tenahiya netewî yan pêşvebirina bazirganiyê, berjewendiyên materyalistî ên dewletan in. Mafê mirovan ji armancên din yên siyaseta dereve bi wê awayê cuda ye ku ew rasterast girêdayî bi berjewendiyên materyal nine. Ev dewletên ku bixwazin mafê mirovan pêşve bibin, xurt bikin, xwe li karek asan nadin. Ev naçar dibin siyasat û ewlewiyetên zehmet hîlbijêrin. Digel wê jî hin dewlet hene yên ku pêşveçûna mafê mirovan kirine armanca siyaseta xwe ya dereve.

*** Ew rêze gotare wergerana pirtûka "The Rol of Human Rights in Foreign Policy" nivîsina professor "Peter R. Baehr" e.**

RONÎ

Quncikek ji bo şiroveya bûyer û babetan ji xwendevanên "Agirî" re

Ebdullah Hicab



Awirek Ji Dîrokê

Min li meşa ber bi azadiyê ve ew nihênî vedozi ku dema meriv ji çiyayê bi serdikeve, temaşe dika

ku hêj gellek çiyayên din li ser rê ne ku pêwîst e meriv jê bi ser bikeve. Niha ez hinekê bêhna xwe vedidim ji bo ku temaşeyî dîmenên delal yê li dewra xwe bikim, ji bo ku awirek ji rabirdûya xwe bidim. Lê ez tenê dikarim ji bo dema kin rawestim, ji ber ku azadî erkan dixê ser milê meriv, û ez nikarim pîr li bendê biminim, ji ber ku meşa min ya ber bi azadiyê ve hêj bi dawî nebûye" (Nelson Mandela: Riya azadiyê, 1994.

Damezirandin û têkçûna Komara Kurdistanê yek ji evraz û nişivên li ser riya meşa ber bi rizgariya neteweyî li Kurdistanê bû ku şunwarê diyar li ser bîreweriya dîrokî ya netewa Kurd daniye. Lênihêrîn ji wê bûyerê, xêncî aliyê xwe yê dîrokî, hingê dikare ji bo demê û pêşerojê bi wate be ku weke rênîşana meşa ber bi azadiya neteweyî ve bê bikaranîn. Komar, digel ku li ser rûberek berteng ji axa Kurdistanê û bi programek tenê li ser bingeha bernamaya Partiya Demokrat ya Kurdistanê (PDK) hate avakirin, lê mîna sembolek ji îradeya siyasî ya netewa Kurd di dîrokê de ciyê xwe kiriye.

Lewma her sal di salvegera damezirandina Komarê de, hema hemû partî û rêxistinên Kurdistanî, bi tayet partiyên ji Rojhilata Kurdistanê bi rûreşmên berfireh û pîr ji hest û soz, Komarê û damezirênerên wê bi bîr tînin. Bas ji destkevtên Komarê û manaya wê ya dîrokî tê kirin. Her alî xwe girêdayî bi rêbaza Komarê nîşan dide. Zarokan bi navê Komarê tînin binavkirin, pişangeh li ser Komarê vedibin, semînar û sempozyom tînin lidarxistin û hwd.

Lê di piratîkê de ruhê Komarê û mesaja neteweyî ya Komarê ne tenê nayê vejiyandin û nûjenkirin, lê weke tu bêjî Komar tenê xemla dîrokê be, hema di çarçoveya arşiv û bîranînan de dimîne. Ji ber wê hindê wateya bîranîna Komarê berî ku mîna dersek dîrokê bê temaşekirin, weke emrazek ji bo dana meşrûiyetê bi kêmasiyên demê re tê bikaranîn. Lewma niha êdî dema wê hatiye em bi nêrînek rexnegir ji rûreşmên weha binêrin û bi çavek ber bi pêşerojê awirekê ji dîroka Komarê bidin.

Dem a bi dîtinek weha em seyrî dîrokê û dersên ji Komara Kurdistanê bikin, pîrsa sereke dibe ev; ka gelo heta kengê tenê bi çavê hest û romantîzma siyasî temaşeyî

Komara Kurdistanê bê kirin û dîroka avabûn û têkçûna wê weke şahî û şînek neteweyî bê dîtin? Bi wî çavî temaşeyî dîrokê kirin tîrêja li ser bîranîna dîrokê, vedigerîne ser dersên ji wê bûyerê derdikevin û erkên ew bûyerê dixê ser milê nivşa îro. Ji bo vê guhertinê, pêwîst e giringî ji mesaja siyasî ya Komarê re bê dayîn û ew pîrs bikeve rojevê ka bi çî awayî ew mesaj dê karîgeriyê li ser siyaseta rojê û pirojeya pêşerojê bike?

Siyaseta Komara Kurdistanê li ser bingeha bi hev re jiyan û dialogê hatibû danîn. Hem di pîrsgirêkên hundir û hem jî di kêşeya bi aliyê din re hertim Komarê riya lihevhatin û ji hev fêmkirinê digirte pêş. Di siyaseta de jî Komarê pilan û pirojeyên kar bi bingehe digirt û di dema kin de jî siyaseta, perwerde, parastin, kultûr û pêşketina aborî re bernamaya kar danî. Her çend ew pilan bi astengiyên re rûbirû bûn û pîranî her li ser kaxezê man, lê projeyên kar bûn. Lê bi têkçûna Komarê re, bi awayek berfireh dirûşman ciyê pilanê kar girt û hest û soz ketin ciyê eqlaniyeta siyasî.

Diyare li Rojhilata Navîn, pîrsgirêkên civakî, siyasî û aborî û mewdaya di navbera desthilatdar û xelkê de, ji bo avabûna wê kultûra tejjî ji hest û dîr ji eqlaniyeta siyasî karîgeriya herî mezin hebûye. Lê çawanî û hegera avabûna wê şêwe kultûrê nayê wê manayê ku bandora neyênî ya wê kultûrê nekeve rojê siyasî. Di çarçoveya wê kultûrê de li ciyê pilana kar, bernamaya bo pêşerojê û gerra li pey pîvanên hevbeş ji bo karê bi hev re, romantîzmek siyasî çî digre ku li ser bingeha jiyanê di dîrokê de hatiye avakirin. Ew kultûr tenê li ser hîmê dirûşm û pesindana dîrokê dijî û meşrûiyeta xwe ne ji kar û xebata rojê û pilana pêşerojê, lê ji pesindanek dîr ji eqlaniyeta ji bûyer û kesayetiyan dîrokî digre, û bi girêdanek sîbjektîv bi nîrxên dîrokî ve derfetê ji lihevhatin û danûstane re nahêle. Ji ber ku xwediyê wê kultûrê hertim xwe û nîrxên xwe weke navend û bingeha rastiye dihesibîne û xwe û bi tenê XWE xwdiyê nîrx û destkevtên dîrokê dihesibîne.

Di bin siya wê têgehîştinê de kultûra "bijî" û "bimre" ava bûye ku xala hember kultûra demokrasî û qebûlkirina hevudin e. Ew pêvajoya siyasî ku li jêr karîgeriya weha kultûrêkê tê meşandin bi xwe re wêranî û tunekirinê tîne. Heger û hokar her çî bin, encam yek e: hebûna aliyekê bi tunebûna aliyê din re girêdayî ye. Girêdana bi ruhê Komarê re dixwaze ku sînorek ji wê kultûrê re bê danîn û eqlaniyeta ciyê silogana bigre.

Komara Kurdistan ne bi navê partiya

damezirêner û ne jî li ser navê bireveberê xwe ve tê naskirin. Komar sembola îradeya siyasî ya gelê Kurd bû ku ji bo serweriya neteweyî dixebitî. Di gotar û helwestên Pêşewa Qazî Mihemed de dîrok û qedera hevbeş ya netewa Kurd reng vedida. Lê îro li ser navê xwedî derketin ji nîrxên Komarê, hewl tê dan ku kultûra ji hev belavkirin û netifaqiyê bi pêş bikeve.

Ji aliyek din ve Komar xwedî nasnameya xwe ya serbixwe û yekgirtî bû. Tevgerên siyasî yê Kurd li pey salên tevçûna Komarê re, hêdî- hêdî ji wê pîvanê dîr ketin û hewl dan ku nasnameyên cuda ji hev bo netewe ava bikin, û pirojeyên hizbî li ciyê pirojeya neteweyî pêşve bibin. Her li Rojhilata Kurdistanê îro bi kêmi 3 projeyên li dijî hev û her yek ji wan projeyan jî di nava xwe de bi çiq û şaxên ji hev belav dixwazin Komara Kurdistanê ji bo meşrûiyeta xwe bi kar binin.

Aliyên beşdar di tevgera Kurdistanê de bi wê siyaseta ji hev dîr û belav, çiyayên li ser riya azadiyê hêj asêtir û riya serkevtinê hêj dûrtir dikin.

Ji bo bicîanîna mesaja siyasî ya Komara Kurdistanê her yek ji beşdarên tevgera siyasî ya îro a Kurdistanê, çî tak û çî partiyên re erkekek hevbeş di rojevê de ye, ew jî ew e ku ji bo avakirina pilatformek hevbeş a neteweyî pilansazî bikin. Ji derveyî pilanek weha, tenê bi xebata li ser bingeha bernamaya yek partiyê, ew jî di rewşekê de ku partî ji hev belav in û di nava xwe de jî bi qebên (lêger/çalîş) cidî re rûbirû ne, armancên Komarê bicî nayên. Li meşa ber bi siberojê ve, wê demê partî û rêxistinên siyasî yê Kurdistanê dikarin cidîbûna xwe û dilsoziya bi gel û pîvanên Komarê re biselîmînin ku ji çarçoveya partiyê berfirehtir, ji pilatformek hevbeş ya neteweyî bifikirin.

Pirojeyek neteweyî ya hevdem dikare bîranînen Komarê bi wate bike û bibe bingehe ji xebatek hevbeş ji pêşerojê re. Tenê di rewşek weha de hêvî û armancên Komarê bi çî tîne. Ji wê bi der, ne bîranînan tu mana xwe dibe û ne jî girêdana bi rêbaza Komarê re tu pêwendiya xwe bi rastî û ruhê Komarê re dimîne. Partiyên siyasî yê Kurd li Rojhilata Kurdistanê heta ku ji pêkanîna weha pilatformekê re amade ne, dê rojên pêşiya me nîşan bidin. Lê ji bo ku armancên Komarê bicî bînin, rawestana zêde di rawestgeha demê de kêmasiya herî mezin e. Di wê rawestgehê de êdî ne dîmenên derdorê reng û mana hene, ne jî rabirdû ji pêşerojê re xwedî mana dibe.

Gelî Hevalan ! Eger Hûn Çûn, Min Cî Nehêlin!



Silêman Keleşî

Her wek di beşa yekem de hate baskirin, wextê hindê hatibû ku girûp û desteyên Pêşmergan bi vî awayî ku hatibûne parvekirin, ji hev veqetin û her yek ji wan desteyan bo alî û cihê operasyon û karê xwe bimeşin. Pêwîst e bibîr bînim ku baskirin ji wê bûyerê tenê baskirin ji van tiştên ye ku min dîtine û tenê dîtayên takekesekê ne. Xuya ye ku di şereke wiha berfireh de mirov nikare hemû aliyên bibîne. Bêşik min jî nekariye gellek bûyer û qewimînên ku di wî şerî de hebûn, bibînim. Bes bila kes wiha nekare ku eger min bas ji tiştê ku hevalekî kiriye di nivîsê de bas nekariye, înkara wê bûyer yan jî wê yekê bikim ku xêncî ewa min nivîsî ye çî bûyer û fidakariyên dinê di wî şerî de çê nebûne.

Belê em herin ser eslê meselê.

Ew çar deste bi vî awayî hatin parvekirin:

Girûpa yekem ku desteya herî mezin bû, bi Fermanderiya **Şehîd Mela Xalid Baqî**, Fermanderê hêza Şehîd Sergurd Ebasî û hevalê Şehîd, Kekê **Elî Kasîfbûr** û çend berpîrsên din bo gundê Berdîyanê ku ji meydana operasyonê dûr bû, hate destnîşankirin. Erk û wezîfeyên wê destê ewa bû ku wek hêzeke bêhnvedayî û piştîvan di gundê Berdîyanê de cihgir be û ciyên hasas û stratêjîk bo şer li wir kontrol bike heta ew tîm û desteyên ku di operasyonê de bûn, bi rihetî bihêne gundê Berdîyanê. Her wisa eger roja dû re dijmin êrîş kire ser Pêşmergan, ew wek hêza bêhnvedayî û amade, tevî dijmin şer bikin. Hêjayî gotinê ye ku derdora gundê Berdîyanê bo şer minasib bû.


Desteya duyem jî desteyek mezin û berfireh bû ku ji bo gundê Zêvecûkê hatibû danîn. Gundê Zêvecûkê ser bi bajarê Selmasê ye. Ew girûpa navenda fermanderiya şer, piştevanî û rêkûpêkkirina destek û tîmên emeliyatî bû. Her wisa parastina cîh û rêya vegeyîrana hevalên ku çobûn bo nava bajarê Selmasê û ew tîmên ku rêya Urmiye – Tehranê girtibûn bin zêrevaniya xwe, û arîkarkirin bi tîmên emeliyatî di wextê pêdivî de jî erkên wê desta duyem bû. Bi kurtî dikarim bêjim ku tîma fermanderî û lojîstîkî bû.

Ez bi xwe yek ji endamên wê tîmê bûm ku fermanderiya wê û tîmên din yê emeliyatî li stûyê Şehîd Hesên Îbrahîmî (Bazûke), F. hêza Şehîd Hatem bû. Kek Hesên bi xwe xelkê wê deverê bû û ew devera jî meydana kar û xebata wî û

hevalên din ên wê hêze bû. Ji ber vê hindê, wî bi başî cî û rê nas dikirin. Divê eva jî bihê gotin ku gundê Zêvecûkê nêzik û zal bû li ser qada şer û me dikarî di dema hewce de arîkariya hemû tîmên beşdar di şer de bikin û bi hawar û gaziya wan biçin.

Girûpa sêyem jî gellek Kadro û Pêşmergeryên şareza û çeleng pêk hatibû ku bikarin bi başî erk û wezîfeyên ser milê xwe di wî cihê hassas de bicî bînin. Hewce ye bê ronkirin ku ew girûpa li wextê gihîştin bi ciyê operasyonê, dibû çend deste û girûp. Desteyek ji bo derbelêxistin ji binkeyên aborî (ekonomî) yê hikumetê, desteyek ji bo kontrolikirina rêya eslî ya (cadeya tiranzîti) Urmiye – Tehranê û qisekirin tevî rêwîyan (misafirên), ji ber ku di wê rêyê de di her deqîqê de dehan otombîlên cur bi cur hatin û çûnê dikin.

Du desteyên din jî ji bo bersivdan û kontrolikirina hêzên dijmin li her du aliyên cadê di navbeynek dûr hatin diyarkirin ku tîma sêyem bikare bi



awayekî rihet otombîlan bisekinîne û ji bo rêwîyan biaxivin.

Destê çarem ku desteya dawiyê ye, ji bo derbelêxistin ji komîte û binkeyên Sipaha Pasdaran ya Şorişa Îslamî (hêza komkujiya kurda) di nava bajarê Selmasê (Dileman) bû. Heke bi başî di bîra min de mabe, fermanderiya wê destê li stûyê **Şehîd Feramerz ...** bû.

Lê hemû deste û girûp ji aliyê Fermanderê giştî ve hatin destnîşankirin, îdî her tîmek tevî tiştên hewce û amadeyî meşyanê bûn. Êvar bû û diniya hêdî hêdî ber bi aliyê tarîbûnê ve diçû. Her yek ji wan desteyan tevî rênas û kesên şareza ên xwe ji bo aliyê meqseda xwe ya diyarkirî ketin rê. Tîma ku ji bo gundê Berdîyanê hatibû diyarkirin, bera xwe dane aliyê jor û her sê tîmên din jî yek li pey hev xwe di nava dilê şeva reş û tarî û sir û seqema zivistanê de mîna masiyan di nav behrê de, mat û bêdeng winda kirin. Wan kurr û bi bêdengî di nava dilê şevê de rê dibirîn û xwe ji amanc û meqsedê nêzik dikirin. Hemû ew tîm û destek ji aliyê Fermanderê giştî bi rêya Bêsimê (aleva bi hev re axavtinê)

Beşa 2

ve dihatin rêkûpêk û rênîşankirin. Qerar û destûr wisa bû ku heta tîma nava bajarê Selmasê negihîje ciyê xwe, ew tîmên din yê emeliyatî çî liv û tevgeran nekîn. Bername hemû li gorî destûr û pîlanên ku hatibû darêtin, pêşde diçû. Her tîm bêdeng û bê pistepist ji kêlek û qeraxên gundan re dimeşyan û xwe ji armancê nêzik dikirin. Tîma me ku tîma Fermanderî, piştevanî û bi hawardeçûnê bû, gihîşte gundê Zêvecûkê. Piştî gihîştina me bi wî gundî, me hemû ew cî û rêyên ku jî bo me hatibûn destnîşankirin, girtne bin kontrola xwe. Hemû desteyên emeliyatî dem bi dem ji rêya Bêsimê, Fermande kek Hesên Bazûke ji rewşa xwe haydar dikirin û wî jî destûrên hewce dida van. Hemû tişt bi başî û xweşî ve û li gora bernama hatîdanî pêşde diçû. Dîsa heval hemû pîrr bi heyecan in û bêdeng û mat li ciyê ku ji bo wan hatibû destnîşankirin, erkên xwe bi cî tînin. Hemû çavniher in kanê dê kengê bi Bêsimê yan jî dengê teqandina RPG-7ê dê bêdengiya şeva sar a zivistanê bihê şikandin. Stêrkên geş bi xemilandina esmanê şîn yê Kurdistanê li hinda serê bajarê Selmasê xwe hazir kirine ku peyama serkevtina operasyonê Kadr û Pêşmergeryan ji me re bînin. Lê em hemû bêdeng difikirin ku dê encama wê operasyonê berfireh bibe çî!?

Ew hemû bêsebrî û diikute bi dengê lêxistina APG-7an ji binka Sipaha Pasdaran li bajarê Selmasê dawî pê hat. Şer di nava bajarê Selmasê de dest pê kir û rêya Urmiye – Tehran û derdora bajêr hemû bûne qada şer. Her deste û taximekê bê yek û du xeberên şer û operasyonê xwe ji bo navenda Fermanderiyê dişandin. Dem bi dem xeberên xweş û xwestîr dihatin. Gava me rewş û halê hevalan jî dipirsî, wan digot ku hemû silamet in û kar pîrr bi başî diçin pêş û zêdetir ji wê çenda ku me dixwest, em armancên xwe dimeşînin. Bi bihîstina van nûçeyên xweş, ji keyfxweşiyên ve, dev û didanên mirov li ser hev nedisekinin û tim û tim mirov gerimtir dibû. Pîrr hevalan jî xwezî û hêvî dixwestin ku em jî di nava şer de bana.

Xelkê gund jî tevî hevalan keyfxweşiya xwe nişan didan û dipirsîn xo Şehîd çî nînin. Gava me ji wan re digot ku tu Şehîd û birîndar nînin, hîn zêdetir dilşa dibûn û digotin: şukur!

Wan serkevtina Pêşmergeryan bi serkevtina xwe dizanîn û her di rastî de jî wisa bû. Her wek min berê jî bas kir, desteya piştevan desteya herî nêzik ji bo meydana operasyonê bû. Ji ber vê çendê hemû hevalan dem û gav

63 salan berî niha, bi avakirina Komara demokratîk a Kurdistanê li bajarê Mehabadê, kurd bûn xwediyê yekemîn desthilata modern û pêşkevî.

Komara Kurdistanê ji aliyê PDKÎ ve hate damezrandin. Pêşewa Qazî Mihemed, rêberê partiyê bû Serok Komarê Kurdistanê.

Agirî 4 rûpelên zêde weke paşkoya hejmarê 104 a weşanê ji bo bibiranîna vê hinceta netewî terxan kiriye.



Paşkoya taybet bi hilkevta 63'hemîn salvegera avabûna Komara Kurdistanê 30'ê Çileyê Paşîn ya 2009 Hejmar: 104

Cejna 2'ê Rêbendanê, Li Binkeya Deftera Siyasî A PDKÎ Hate Pîrozkirin

b i hinceta pîrokirina 63'hemîn salvegera avabûna Komara Kurdistanê roja çarşem,

21.01.2009'an, di binkeya Deftera Siyasî a PDKÎ, , rê û resmek hêja û berfireh hate lidarxistin. Rê û resm bi xwendina sirûda neteweyî a "Ey Reqîb" û deqîqeyek bêdengî bona rêzgirtin ji canê şehîdên Kurdistanê dest pê kir. Piştê rêzdar Têmur Mistefayî, endamê Deftera Siyasî, peyamek bi hinceta 63'hemîn salvegera Komara Kurdistanê pêşkêş kir û tê de îşare bi guhartinên niha yên cîhanê û bandora wan li ser Komara Îslamî a Îranê kir. Paşan peyama YDKÎ ji aliyê Êlham Çayçî, endama Komîteya Birêveberiya Giştî ya vê rêxistinê ve hate xwendin. Dûre jî Bêhrûz Lutfî, straneke folklor pêşkêş kir û piştî stranê, peyama YCDKÎ ji aliyê Dara Natiq, Sekreterê Giştî yê wê rêxistinê ve hate pêşkêşkirin. Di beşek din a rê û resmê de, du sirûd bi navên



"Sipêde" û "Heqîqet" ji aliyê komara muzîk û hunerî, pexşanek bi navê "Jiyaneve", ji aliyê Saman Darvend û pexşanek bi navê "îro cejn e", ji aliyê Ferzad wehabzade ve hatin pêşkêşkirin. Piştî xwendina pexşanan, peyama YDKÎ ji aliyê Nasir Salihî, Sekreterê Giştî yê rêxistina han ve hate xwendin. Dûre koma hunerî straneke folklor pêşkêş kir û bi stran û muzîkên şad cejn xemilandin. Rê û resm bi dîlan û govend beşdaran bi dawî hat.

Li Navenda 3 A PDKÎ, 63'hemîn Salvegera Komara Kurdistanê Hate Pîrozkirin

R oja pêncşem, 22.01.2009'an, cejna 2'yê Rêbendanê, 63'hemîn salvegera avabûna

Komara Kurdistanê, bi beşdariya berpirsiyarên navenda 3, nûnerên partî û rêxistinên siyasî, endamên PDKÎ li komîteyên Hewlêr, Soran û kampên kawê û Barîke û her wiha Kadro û Pêşmergeyên Navenda 3 a Kurdistanê, di wê navenda PDKÎ de bi coşeke germ hate pîrozkirin.

Piştî xwendina sirûda neteweyî a "Ey Reqîb" û deqîqeyek bêdengî ji bo rêzgirtin ji canê paqij yê şehîdan û bi taybet nemir Pêşewa Qazî, rêzdar Sidîq Derwîşî, endamê Komîteya Navendî û berpirsê Navenda 3'ê ya Kurdistanê, peyamek bi vê hincetê pêşkêş kir. Piştê jî 63 mom, bi

hinceta 63'hemîn salvegera avabûna Komara Kurdistanê, ji aliyê Sidîq Derwîşî û her wiha nûnerên partî û rêxistinên siyasî ve hate hilkirin.

Dûre jî tiyatroyek bi navê "Rola Cotkaran di Komara Kurdistanê û xebata Partiya Demokrat de" hate pêşkêşkirin.

Piştî nimayîşkirina wê şanoyê, loha rêzlêgirtinê bi hinceta pitir ji 20 salan xebat di nav refên PDKÎ de, ji aliyê Sidîq Derwîşî ve bi Nadir Sedrî û Bêhrûz Xellîlî hate pêşkêşkirin.

Di beşek din a şahiyê de, sirûda "Cejna te pîroz dikim" ji aliyê Koma hunerî a Yekîtiya Jinan li Cêjnekanê hate pêşkêşkirin û şûnde jî peyama hevbeş a Yekîtiya Jinan, Ciwanan û Xwendekarên Komîteya Hewlêrê, ji aliyê "Zekiye Sedîqî" ve hate xwendin.

Di germegerma rê û resmê de, girûpa dîlana "Pêşmerge", bi deng û stranên hunermendê dengxweş "Arif Çopan", şahiya han pitir xemilandin.

Piştê jî du pexşan bi navên "Komara Canemêrğa min" û "Pilingên erdê welat" ji aliyê Îsmail Ercimendî û Selam Girdesûrî hatin xwendin.

Sirûdek bi navê "Rabe ser piyan", ji aliyê koma sirûda zarokan a Navenda 3 a Kurdistanê ve hate pêşkêşkirin.

Hêjayî gotinê ye ku peyamên pîrozbahiya partî û rêxistinên ku bi vê hincetê hatibûne şandin, ji aliyê pêşkêşkarê rê û resmê ve hatin xwendin. Rê û resm bi şahî û dîlana beşdaran û bi dengê hunermendê dengdelal Arif Çopan, demjimêr 17'ê êvar di nav coşa germ ya beşdaran bi dawî hat.

Peyama Deftera Siyasî Ya PDKÎ Bi Henceta 63'hemîn Salvegera Avabûna Komara Kurdistanê

M êvanên rêzdar!
Xûşk û birayên ezîz!
Hevalên xebatkar!

Hûn bi xêr hatin ji bo şahiya 2'yê Rêbendanê, 63'hemîn salvegera avabûna Komara Kurdistanê, ez ji aliyê Deftera Siyasî a PDKÎ ve bi dil û can bixêrhatina we dikim.

Beşdarên hêja!

63 salan berî niha di roja 2'yê Rêbendana sala 1324'an a Rojî (21.01.1946), Pêşewa Qazî Mihemed, rêberê Partiya Demokrata Kurdistanê di axavtineke dîrokî û bihagiran de, Komara Kurdistanê di meydana Çarçira a bajarê Mehabadê de ragihand. Pêşewa Qazî Mihemed di beşek ji wê axavtina xwe dibêje:

"Serkevîna me encama bîr û ramana demokratîk a me û demokrasîyê ye. Neteweya Kurd weke hemû neteweyên din ên yê cihanê mafê azadî û hîlbijartinê heye, bi salan e neteweya me ji bo mafên xwe yê herî destpêkî xebatê dike û di vê rêyê de hezaran gorî daye, sorgulên biharên Kurdistanê bi xwîna Şehîdên Kurdan hatine avdan, goristana Şehîdên rêya azadiyê di hemû ciheke ve Kurdistanê de nişana têkoşîn û berxwedana ve neteweya mafxwaz e, ew Şehîdên ku şahidê roja serkevîna nebûn û axê ew hambêza kirin".

Weke ku di beşek ji gotara Pêşewa de derdikeve holê, pêkhatina Komara Kurdistanê, encama tevgerê neteweyî – demokratîk bû ku hewla bidestveanîna mafên gelê Kurd di Îraneke demokratîk de dida.

Lewra xwezayî ye ku ji aliyê di herêmên bin desthilatdariya Komara Kurdistanê de rêz li azadiya xebat û têkoşîna siyasî bihê girtin û kêmaniyên neteweyî û olî di etmosforeke dostane û azad de bijîn û ji bo serkevîna ve komarê bixebitin, ji aliyê din ve jî kevneperestiya zal bi ser welat a wê demê çavê dîtina ve desthilata demokratîk tu nebû û herdem bi komplo û pîlanên dixwast ku Komara Kurdistanê ji nav bibe.

Komara Kurdistanê di heyamê 11 mehan têkoşînê de, gellek destkevîtan hêja û binirx ji gelê Kurd re bi diyarî anî, bidestketinên weke: pêkanîna arteşa netewî, xwendin û nivîsîn bi zimanê Kurdî, çap û weşandina kovar û pirtûkên cur be cur, avakirina Yekîtiyên Jinan û Ciwanan û ji hemûyan girîngtir cihgîrkirina azadiya siyasî ku heta wê dem di deverê de bêmînak bû.

Arçî Rozwelê Amerîkî dema ku di



serdemê Komara Kurdistanê de serdana Mehabadê dike, dibêje: "Mirov ji wê rewş û fezaya azad ku di Mehabadê de heye, ecêbmayî dimîne".

Serencam, Komara Kurdistanê piştî 11 mehan hewl û tekoşîna bêrawestiyên û bidestvehatina gellek destkevîtan dîrokî û bihagiran, bi sedema êrîşa kevneperestiya desthilatdar û hevalbendan hîloşiya, lê bandora wê komarê di dîroka gelê me de her berdeyam e û ciyê rûmet û şanazî û derswergirtinê ye.

Hevalên rêzdar!

Piştî hîloşîna Komara Kurdistanê, xebat ji bo rizgarî û azadiyê bo demê jî nesekinî, keç û xortên xebatkar ên gelê me hewil dane, di her derfeteke jêhatî de daxwaziyên rewşa û berheq ên neteweya me bi awayekî aşîxwazane ji bo çareserkirinê binin holê, lê dijminên maf û azadiya gelê me, rejîmên dîktator û serberedayî ên welatê me ku ji bilî zimanê gef û gurr, kuştin û birrînê lojîk û mentîqeke din nas nakin, bersiva xwestekên berheq ên gel bi agir û hesin, kuştin û birrîn, dermandan û pîrr komplo û pîlanên din ên nemirovane dane, lewra ji bilî berxwedan li hember pêvajoya qirkirina gelê me tu rêyeke din ji bo keç û xortên xebatkar yê gelê me re nemaye.

Xebata mafxwazane a neteweya Kurd li Kurdistana Îranê bi rêberiya PDKÎ zêdetirî şeş dehsalan e ku di pêxema diyarîkirina mafê çarenivîsê de dom dike û di vê rêyê de bi hezaran keç û xortên netirs û wêrek fida û gorî bûne, lê bi kêfxweşî ve gelê me li hember wan hemû serkut û çewisandinan de bêdeng nemaye û niha jî bi hemû awa û şêklên cur bi cur, ji bo bidestxistina mafên me ên netewî di pêxema cihgîrkirina sistemeke demokratîk a federalî de xebatê didomîne û roj nine keç û xortên kêrhatî û xwedî şîyan ên gelê me destanek ji qehremanî û mîrxasiyê,

destanek ji berxwedan û netirsîyê li hember dijminên gel me de tomar nekin û di girtîgehên bixof û tirsnaq ên rejîmê de bi dengê dilê ê xwe sirûda: "Ey Reqîb"ê nebêjin û bi vî awayî vîn û îradeya xwe ya xurt li hember dijmin ji bo xebat di rêya azadî û rizgariya neteweya Kurd de nişan nedin.

Pêşewayê nemir Qazî Mihemed, 62 salan berî niha di civîneke giştî a xelkê de li bajarê Mehabadê, di gotareke girîng û dîrokî de ku di hejmara 50 a rojnameya KURDISTAN'ê de belav bû, dibêje:

" Heke di Îranê de azadî cihgir bibe, çî arîşeyek heye ku Îranî destê biratiyê bidin hev û di kêleka hevdu de, birayane bijîn, Soviyetê çendî Komar hene, Amerîka çil û çend Komar hene, çar neteweya li Swîsê dijîn, lê li rex hev û bi yekdîl û yekdeng j bo pêşdebirina welat dixebitin. Me jî serbarê hebûna nakokî û dijheviyan bi Azerbaycanê re, azadî û demokrasî kire xala hevbeş a biratiya me û em bi neteweyên din ên Îranê re jî radigehînin ku em ne li dijî tu kesî ne, hûn jî dest ji top, teyare û tankan berdin. Me ji wan re got, em jî weke neteweyên din mirov in ku mafên însanî hene, gelo ma neteweyê din ji bilî me di bin xêsrî û bindestiyê de maye? Welatên pêşektî ên cihanê tenê bi sedema ve yekê pêşverû ne ku karê xwe bi destê xwe dimeşînin û dilsozê xwe ne û her tiştê wan yê wan bixwe ye, rê dibin gelê me jî, bila xwediyê hebûn û nebûna xwe bixwe be, bila ew tişt ku dixwaze, bixwe hîlbijêre".

Hevalên qedirgiran!

Niha jî ku 63 sal ji wê demê derbas dibe, di wê heyamê de bi dehan neteweya çar goşeyên cihanê de, gihîştine mafê diyarîkirina çarenivîsa xwe û dewleta serbixwe ava kirine, Kurd jî weke neteweyekê, her çend

mafê dewleteke serbixwe heye, lê bi şîrove û dahûrandinê, ji bo çareserkirina pîrsa Kurd li Îranê, dirûşma federalîzmê hilgirtiye, lê mixabin lojîka desthilatdarên zal bi ser Îranê neguherî ye û niha jî ku çaxê cihanbûn, cihana ragihandin û pêwendiyên lezgin e, dixwazibin bi serkut û qirkirinê bersiva daxwazên berheq ên gelê me bidin.

Ya ku ji wê jî zêdetir cihê kul û keserê ye, eva ye ku komek Opozîsyona binav demokrat jî her bi wê cure lojîkê serederiyê dike ku Komara Îslamî a Îranê tevdiğere û avakirina sistemeke federal di Îrana pêşerojê de weke fakterek ji bo hîloşîna Îranê dizanin û

Agirî-Taybet

dixwazîna pêvajoya dîrokê ber bi paşve vegeerînin. Di demekê de ku federalîzm di Îrana pêşerojê de ne tenê nabe sedemê parçebûna Îranê, belku di çarçoveya Îraneke demokratîk a federal a rasteqîne de yekîtiya welat misoger û ewle dibe û tenê di rewşa bêmafkirina neteweyên pêkîner ên Îranê de, hegera parçebûn û ji hev veqetiyane zêdetir derdikeve holê.

Hevalên ezîz!

Di vê roja dîrokî de, ezê lînêhêrinê bi ser çend bûyerên girîng bikim ku bandora wan li ser pirsên siyasî yên herêmê û analîz û şîroyeyên di vê derbarê de heye:

Di sewiya navneteweyî de

1. Ew kirîz û qeyrana aborî ku di cîhanê de hatiye rojevê û yê bûye sedema liv û tevgera berfireh li welatên cîhanê û buhaya nîftê di bazara cîhanê de, ji bermîlek 140 Dolar, dabezî 40 Dolar ji bo

her bermîlekê. Ev dabezîna buhaya petrolê, her çiqas li ser aboriya gellek welatan bi bandor bû, lê tesîr û karîgeriya wê li ser Îranê dê zêdetir û berfirehtir bibe, ji ber ku aboriya Îranê aboriyek tekpaye û li se nîftê ava bûye.

Bê guman heke dabezîna buhaya nîftê her wisa dom bike, welatê Îranê dê tevî kirîzeke berfireh berbirû be ku bandor li ser dabezîna asta jiyana xelkê dibe û di wê rewşê de egera rûbirûbûn û pevçûna zêdetir a xelkê û desthilatê dê derkeve holê.

2. Hilbijartina Barak Obama di dengdaneke dirêjdem û azad û demokratîk de ji bo Serok Komariya Amerîkayê, bi çend sedeman ve dengvedana berfireh di asta cîhanê de hebû ku yek ji wan sedeman eva bû ku bo cara yekemîn di dîroka Amerîkayê de çermreşek ji bo Serkomariya wî welatî hate hilbijartin û rola çermspiyan di wê

hilbijartinê de xuya bû ku eva nişana kûrbûna binc û rîşala demokrasiyê di welatê Amerîkayê de ye. Heke me wan hilbijartinan tevî hilbijartina Serok Komariyê di Îrana Îslamî de bidin berhev ku divêt Serok Komar mîrekî siyasî, Şîeyê "esan eşerî" (12 Îmamî) û pêrewê "Welayeta Mutleqe a Feqîh" be, bi gotineke kurt û kin, kesekî helandî di Welayeta Feqîh de be û ji çendîna bêjîng û safiyandêr derbas be, wê demê em dê baştir tê bigihîjin ku mixabin xelkê welat me rastî çi şebehekê hatine.

Helwesta rejîma Îslamî a Îranê di dema hilbijartina Serok Komariyê di Amerîkayê de, zêdetir alîgirî ji Barak Obama bû.

Bi wê hêviyê ku bi çûna Komarixwazan û hatina kesekî Demokrat ew jî çermreş ku bas ji diyalog û çareseriya aştxwazane dike, di cîbicîkirina armancên wan de bibe hevkar û her ev şîroye jî bû ku bo cara yekemîn di dîroka hatine serkara Komara Îslamî de ji aliyê Serkomarekî tundajo wekî Ehmedînejad ve peyama pîrozbahiyê ji bo Obama hate şandin ku heta niha jî ji aliyê Barak Obama ve nehatiye bersivdan. Obama heta niha di axavtinên xwe de, serbarê vê yekê ku basa gotûbêjên rasterast tevî rejîma Îranê dike, lê di heman demê de li ser siyaseta berê ya Amerîkayê tekezê dike, politîka ku berlêgirtne dike ji bidestxistina çekên Etomî ji aliyê Îranê ve, pêşgîrî ji xurtkirin û piştgiriya Komara Îslamî ji terorîzmê û hwd..., vê yekê Komara Îslamî di pêşdebirina siyasatên xwe ên şerxwaz de bêhêvî kirine, lewra weke berê propagandayên xwe li dijî Amerîkayê didomînin.

3. Di çarçoveya pêvajoya hewildana Îranê ji bo bidestxistina Çeka Navîkî û piştgiriya terorîzmê û destwerdan di nav kar û barên welatên herêmê bicî ye û li vir qala hevalbendiyê din ji aliyê welatên Ereba li hember siyaseta zorxwaziyên rejîma Îranê bikin û eva jî

nişaneyêke din ji têkçûna siyaseta rejîmê û munzewî û terîkîtetina her çiqas zêdetir di civaka navneteweyî û her wiha herêmê de.

Di dawiya sala 2008'an de ku dema mana hêzên Amerîka li Îraqê bi dawî dihat, her du welat anku Îraq û Amerîka projeya peymanê ewlekariyê ji bo mana hêzên Amerîkî heta sala 2011'an dinirxand ku rejîma Komara Îslamî a Îranê ji rêya destê û girûpên nêzik ên xwe li Îraqê bi gefxwarin û bi temahxistina hejmarek ji Îraqiyan cehd dikir ku lihevhatina ewlekariyê nehê pejirandin, ji bo ku welatê Îraqê zêdetir ji berê bixe bin rikêfa xwe û bi dilê xwe di Îraqê de tevbigere ku ev hewl û bizave jî tevî têkçûnê berbirû ma û aqibet du welatan li ser mana hêzên Amerîkayê heya sala 2011'an, lihev kirin û peymannameya han bi fermî wajo kirin.

Derbarê beşên din ên Kurdistanê

Kurd li Başûrê Kurdistanê her çiqas li gor destûrê bi beşek ji mafên xwe gihîştîye û niha jî hikûmeta xwe a Herêmê heye, lê Komek ji pirsgrîkên wê her neçareser kirî mane.

Arîşeyên wek vegeerdina deverên Kurdistanê bo ser Herêma Kurdistanê û pêkanîna rapirsiyê li Kerkûkê û cihên din ku kurd lê niştecih in, ji aliyê din ve çend aliyên Ereba roj bi roja zêdetir hewl û bizava paşdekişan ji destûrê û navendîkirina desthilatê didin û her wiha destwerdanên derekî ên rejîmên Îran û Turkiyê ji bo pêkanîna kosp û astengan li ser rêya ewlehiya Hikûmeta Herêma Kurdistanê cihê xwe ê taybet heye.

Em hêvîdar in hikûmet û xelkê Herêma Kurdistanê bi hilgirtina gavên yekgirtî bi ser wan kospan de zal bibin û Komara Îslamî ya Îranê di bêhêvîtiyê de bihêlin.

Der barê kurd li Bakûrê Kurdistanê, helwesta nû a hikûmeta Turkiyê bi danîna kanalek kurdî û vekirina vê kanalê ji aliyê Serok Komarê Turkiyê ve û danîna çend beşên xwendinê bi zimanê kurdî di zanîngehên Turkiyê de, her çiqas gavên biçûk û destpêkî ne, lê pêngavên berbi pêş tînin hesibandin, em hêvîdar in Turkiye bi avêtina gav û kirinên din rê ji bo çareser kirina doza Kurd li Turkiyê veke.

Silav li bibîranîna 2'yê Rêbendanê, salvegera avabûna Komara Kurdistanê Bihilose rejîma dijîgelî û paşverû a Komara Îslamî

Hûn jî her bijîn bi şadî û kêfxweşî

Ev peyame ji aliyê Têmûr Mistefayî, endamê Deftera Siyasî a PDKÎ ve di rê û resma 2'yê Rêbendana 1387'an(21.01.2009'an) de hate pêşkêşkirin.



63'hemîn Salvegera Avabûna Komara Kurdistanê Li Gund û Bajarên Rojhilatê Kurdistanê Bi Coşeke Mezin Hate Pîrozkirin

Weke hemû salên berê, îsal jî gelê azadixwaz li pîrrianiya gund, dever û bajarên Rojhilatê

Kurdistanê bi lidarxistina çalakîyên berfireh û cur bi cur, cejna 2'yê Rêbendanê, 63'hemîn slavegera avabûna Komara demokratîk a Kurdistanê li Mehabadê ku di sala 1946'an de hatibû damezrandin, pîroz kirin.

Çalakîyên pîrozkirinê ên endam û alîgirên nepenî ên PDKÎ li gund û bajarên Kurdistanê îsal gellek xuya û berçav bûn û endamên netirs û şoreşger serbarê zext û givaşa xurt ya ewlekariya



hêzên hov ên Komara Îslamî a Îranê li hemû bajarên Kurdistanê, bi coşeke mezin çûn pêşwaziya wê roja dîrokî û neteweyî.

Endam û alîgirên PDKÎ li pîrrianiya gund, herêm û bajarên Rojhilatê Kurdistanê bi çalakîyên wek: nivîsîna dirûşmên taybet ên vê hilkevte li ser der û dîwar û cihên giştî, belavkirina tirakt, CD'yên deng û reng û wêneyên rêberên Şehîd, Pêşewa Qazî Mihemed, Dr. Qasimlo û Dr. Şerefkendî, belavkirina şîrnî û şekrokan di nava tax û kolanên gund û bajarên, hilkirina agir li ser bilindahiyên, lixwekirina cilûbergên Kurdî bi zemleke neteweyî, hildana ala Kurdistanê bi nepenî li hin cihên giştî ên gund û bajarên, dîlan û govenda xweşiyê û wd... 63'hemîn slavegera avabûna Komara demokratîk a Kurdistanê weke destkevtêke dîrokî û neteweyî bibîr anîn.

Li Mehabadê endamên nepenî yê PDKÎ çûn ser gora Pêşewa Qazî Mihemed û hevalên wî û destgulên rêz û emegdariyê danîn ser gora Pêşewayê nemir ê Kurd û her wiha ala rengîn a



Kurdistanê jî hildan. Herwiha bi destegulan û hildana ala Kurdistanê li ser gora hunermend, helbestvan û nivîskarên navdar ên wî bajarî ew roja dîrokî bibîranîn.

Ji ber vê hencetê, rewşa awarte li bajarê Mehabadê hatibû ragihandin.

Ew bajarên ku çalakîyên pîrozkirina 63'hemîn slavegera avabûna Komara demokratîk a Kurdistanê di nava bajar û herêm û gundên derdora wan hatin lidarxistin, ev in: Pîranşar, Serdeşt, Merîwan, Sewlawa, Nodşe, Sine, Urmiye, Selmas, Ciwanro, Dêwulan, Bokan, Mehabad, Seqiz, Hewşar, Sayînqela, Dîwandere, Kamyaran, Bane û wd...

Di Gellek Welatên Cîhanê De, 63'hemîn Salvegera Avabûna Komara Kurdistanê Hate Pîrozkirin

Di gellek welatên cîhanê de, Komîteyên PDKÎ bi lidarxistina rê û resm û şahiyên mezin û

girseyî, cejna 2'yê Rêbendanê, 63'hemîn slavegera avakirina Komara Demokratîk a Kurdistanê pîroz kirin û bi coşeke bêwêne çûn pêşwaziya wê roja dîrokî û neteweyî ya Kurda ku 63 salan berî niha yekemîn desthilata nûjn û demokratîk a Kurda li Mehabadê li ser destê Pêşewa Qazî Mihemed, rêberê navdar ê Kurd û rêberê PDKÎ hatibû damezrandin.

Di çend rojên borî de, li Dewletên Yekbûyî yê Amerîkayê, du herêmên Kanadayê, Finland, Swêd, Otrîş, Almanya, Yûnan û..., Komîteyên PDKÎ bi beşdariya endam û alîgir û dostên partiyê û herwiha partî, rêxistinên siyasî, civakî û kesayetiyan siyasî û raweşbîrên kurd ên her 4 beşên Kurdistanê, şahiyên mezin û qirseyî bi vê hencetê ve lidar xistin. Gellek kesayetiyan siyasî, raweşbîr û partî û rêxistinên Îranî û biyanî yê wan welatan jî tevî şahiyên bibîranîna 63'hemîn slavegera avakirina Komara

Demokratîk a Kurdistanê bibûn û peyama pêşkêş kirin.

Di çend rojên tê de, li Beljîkayê, Danîmark, Norwey, Îngîlistanê jî, komîteyên rêxistinî yê PDKÎ de şahiyên lidar bixin û 63'hemîn slavegera avakirina Komara Demokratîk a Kurdistanê pîroz bikin.

Ji bilî peyamên taybet bi vê hilkevta dîrokî, di wan şahiyên de, li ser aliyên cuda cuda ên Komara Kurdistanê û destkevtên wê di 11 meh desthilatdariyê de, û xizmet bi zindîkirina armancên neteweyî û pîroz ên Komara Kurdistanê tekez hatibû kirin.

Bi govend, dîlan û dengê zela û

xweş yê hunermendên Kurd şahiyên han bêtir hatin xemilandin.

Rapora berfireh ya wan şahiyên di beşa Nûçeyên malpera me de bixwînin.



Finland



Yûnan



Swêd

← dihejmartin ku kanê dê kengê ji rêya Bêsimê ve dê hevalên beşdar di emeliyatê de daxwaza arîkariyê bikin û bêjin ku çend hevalan bişînin. Her kesekê xwe ji bo çûnê amade kiribû. Lê heta ku operasyon xilas jî bû tu tîmekê hewceyî bi arîkariyê nebû. Desteya ku çûbûn nava bajarê Selmasê, ji bo derbelêxistin ji hêzên dijmin, karî di nava dilê dijmin de derbên mezin û giran li dijmin bixin û hemû armancên xwe bimeşînin. Bi rastî operasyonêk bênimûne bû.

Her wisa ew desteya Pêşmergeyan ku ji bo derbelêdan li binkeyên aborî yê dijmin hatibû danîn, karî derbeyên giran ên aborî li hikumeta dagirker bixin û dehan otomîl û alavên din ku di xizmeta hêzên rêjîmê de bûn, bişewitînin. Ji ber ku bo hikumeta Melayan, jiyana mirovan tu nîrkek tune ye, lê bi zirarên aborî hîn zêdetir tûre dibe û dixinzire. Destê din jî li ser rêya Urmiye – Tehranê karî wê rêyê bêxin bin kontrola xwe û ji rêwiyan re li ser mafên gelê kurd, siyasetên partiyê û pîlan û kiryarên qirêj û gemar ên dijmin li hember kurdan û hemû gelên Îranê biaxivin. Lê mixabin piştî demeke kurt, hêzên dijmin hatne meydanê û şer dest pê kir. Ji ber vê yekê Kadro û Pêşmergeyan nekarî demê dirêjtir ji bo xelkê biaxivin. Her di wê dema kin û kê de, hevalan karî ji bo sedan kesan qise bikin ku beşek ji wan karmend û xizmetkarên hikûmetê bûn. Her di wî şerî de jî çendî kes ji hêzên şerker ên dijmin hatin kuştin û birîndarkirin û bûne goriyên siyasetên ne mirovane yê Komara Îslamî. Her wisa hindêk ji van jî bi destên qehremanên kurdan hatin êxsîrkirin. Her di wî şerî de jî gellek otomîl hatin şewitandin û hemû Pêşmerge û kadr bi sax û silamet tevî çendî êxsîran vegeyriyane gundê Zêvecûkê ku meydana Fermanderiyê li wir bû.

Êdî şev direng bibû û çend demhejmêrek mabû ji bo şefeq û serê sibê. Lê dijmin her ji tirs û xofê, bê armanc teqê dikir, gule direşandin. Dijmin haydar bibû ku hêzeke zaf a Pêşmergan di herêmê de heye û ji ber vê hindê jî hêza xwe ya herî zêde ji bo derbelêxistin ji Pêşmergan anibû bo van herêmen sînorî. Wan fikir ji vê yekê nedikirin ku parêzvanên Kurdistanê bernamê û pilaneke wiha qurs û mezin di

nava dilê van de birêve bibin. Lewra operasyonê han bû sedem ku wê şevê dişan hêzên dagirker mîna caran li hember kar û hêz û vîn û îradeya Pêşmergeyan de kîş û mat û zelûl mabû û ji tirsan re tenê bê hedef ji xwe re teqê dikirin. Piştî ku hevalan mandînebûn û destxweşî li hev kirin, em hemû bi hev re li gora bernamê bo aliyê gundê Berdiyanê ketin rê. Belê, şev berev direngiyê diçû û diviya hêzên me di dema herî zû de ji bo aliyê gundê Berdiyanê bimeşîn. Heval dişan di nava şeva tarî de tevî êxsîr û destkevtên xwe bo aliyê tîma parastinê bi rê ketin. Befra sipî karîbû heta qasekê tarîtiya şeva sar ya zivistanê bişkêne. Mirov dikarî heta qederekê dûrî xwe bibîne. Ji gundê Zêvecûkê heta Berdiyanê çend seet rê bû. Hevalên beşdar di operasyonê de, her kesî bi heyecan basa şer û bûyerên ku dîtibû, ji hevalan re dikir û em li binevrazê dirêj bi ser diketin. Lê ji ber mandîbûnê ew binevraz her ber çavên min dirêjtir dibû û dawî pê nedihat. Di rêçûnê de jî wek hemû karên din, kesên zîrek û çeleng û yê tenbel û serxwe hene. Ez yek ji wan kesên giran û tenbel bûm eger nebêjim hemû caran lê dikarim bibêjim herî zêde, ez kesê dûmahîkê bûm û hindêk caran jî di xew de dimam. Hevalan pîrr caran arîkariya min dikirin û barê min sivik dikirin. Bi her kul û derdekê be, em ew hevalên dawiyê jî bi serketin. Diniya hêdî hêdî zelal bibû û şeva tarî ku hertim cî û meydana Pêşmergeyan tê de berfireh û vekirî ye, ciyê xwe dida roja ronahî. Hevalên me demek bû ku gihîştibûn gund û em jî bi wê hêviyê bûn ku herin gund û bêhna xwe vedin û demêkê razên ku nivistin ji bo min hemû tiştêk bû. Ji ber ku em bikarin bêhna xwe vedin, tîma parastinê û bêhnvedanê li wir cihgir bû û her tiştêk jî bihata pêş, me hizra wê kiribû û em xatircem bûn ku bikarin bêhna xwe vedin. Bere berê roj derketinê me xwe gihîjande gund. Ewa cara min ya yekemîn bû ku ez diçûme gundê Berdiyanê. Dîtin gund û derdorên wê hemû bo min taze bû. Ez û ew hevalên ku mabûne dûmahiyê, tevî hev çûne ew mala ku ji bo me hatibû diyarîkirin. Her wek min berê ji we re bas kir ku hevalan pîrr caran hevkarîya min dikir û barê min sivik dikirin, wê carê jî kekê Mihemedsalih ku bi **Dirbo** tê naskirin, çeka min tevî xwe biribû (Kekê Dirbo piştî çend salan di şerekê de li devera Geliyê Berandêzê tevî çend hevalên qehreman ên din Şehîd bû. Riha wan şad be). Wextê em çûne wê malê û me çek û rextên xwe danîn, kekê Mecîd Nûrî xelkê gundê Nelas ser bi devera Dolê ku yek ji van hevalan bû, ji min re got: "Dê were istirahetê bike mala te wêran nebe Silêman, te em heşir kirin".

Dûmahîk heye...

Şiroveya Peyvên Siyasî

Berhevkar:
Omid Esxeran
omid_anbi@yahoo.com



Totalîtarîzm

Totalîtarîzm bi wateya hikûmeta bikom û tevalî ye û ji sistemeke desthilatdariyê re tê

gotin ku şewaz û metoda dîktatoriyê digire pêşberî xwe û di giştî kar û barên siyasî, aborî û civakî ên welat de maytêkirinê dike û bi vî awayî rûçik û buhayên azadî û demokrasîyê ji holê radike.

Bi giştî dewletên totalîter bi mifahwergirtin ji girtîgeh û dezgehên polîsê nepenî, hikûmeta xwe qahîm û bihêz dikin û bi şopandina metodên teror û tirsandinê, rêyê li hember her cure rexneyekê digirin û dewsa berbipêşveçûnê dest davêjin gendelî û derkirina yasayên tund û tûj. Alîgirên Totalîtarîzmê berî vê çendê ku desthilatê bidestve bigirin, ji rêya xwenîşandanên berfireh ve, îdeaya rizgarî û çaksaziyê dikin û xwe weke alîgirên demokrasîyê didin nasîn. Lê piştî ku gihîştin desthilatê, tev hewl û bizavên demokrat û azadîxwaz tepeser dikin û rêyê ji ber her cure bas û gazindeyekê li ser sistema desthilatdariya xwe digirin. Yek ji taybetmendiyên berbiçav ên totalîtarîzmê, avakirina kulturek rûyekî ye. Ew her wiha piropagandayê ji bo xizmetkirin û pêşketinê dikin, eva bona vê çendê ye ku ew endamên civakê her di temenê zarokî û nûciwanîyê de bixapînin û di civakê de rewş û zirûfek siyasî a yekgirtî bi vîc û qazancê xwe pêk bînin. Îro rojê mînaka sistemên han di seranserê cîhanê de tê xuyakirin. Weke Hîttler li Almaniyayê ku piştî vê çendê ku gihîşt desthilatê, hemû bingehên demokrasîyê bin pê kir û di hemû kar û barên welat de destwerdan dikir û Alamniya ber bi tîkçûn û jinavçûnê bir.

Çavkanî: (Fehengî Ramiyarî Nîga) Azad Weledbegî (Danêşnamêyê Siyasî) "Political Dictionary" Daryûş Aşorî



Dîmenek ji gundê Ceterê

Têmûr Muradî, Berpîrsê CAPK di hevpeyvîneke taybet bi Agirî re:

XEBAT Û ÇALAKÎ DI NAV GEL DE Û MÎL BÎ MÎLÊ GEL RE, ARMANCA CAPK YE

Di doma pêvajoya avakirin û pêkhatina sazî, komele û rêxistinên siyasî, civakî, çandî ên demokratîk û serbixwe ji bo Rojhilatê Kurdistanê, vê dawiyê saziyek bi navê Civaka Aştî û Pêşveçûna Kurdistanê (CAPK) ji aliyê komek xebatkarên siyasî û civakî ên Rojhilatê Kurdistanê kete nav qada xebata civakî û sival a wî parçeyê Kurdistanê û xebata wê bi awayekî fermî hate ragihandin. Ji bo ku xwendevanên Agirî bêtir vê komeleya civakî nas bikin, haydarê armancên wê, kar û piroje û her wiha çarçoveya kar û xebatên CAPK û çend aliyên din ên çalakiyên komele û saziyên sivil li Kurdistana Îranê bibin, me ev hevpeyvîne bi Têmûr Muradî, Berpîrsê Giştî yê CAPK re pêk ani.

Hevpeyvîn/Azad Kurdî

Ji kerema xwe re, ji bo xwendevanên Agirî xwe bide nasîn...

Di destpêkê de, silav û rêzên min hene ji bo te û xwendevanên Agirî re.

Ez li gundê Howesnê li devera Soma ser bi bajarê Urmiyê hatime dinê, min xwandina xwe ya destpêkî li gundê Howesnê xilas kir û ji bo xwandina bilind ez çûme Urmiyê.

Min di sala 1979'an de xwandina bilind di rîştaya xwezaniyê de kuta kir, ev yek hevdem bû digel şoreşa gelên Îrane û destpêka desthilatdariya Komara Îsalmî, di destpêka sala 1980'an de şer bi Komara Îslamî re li Bakûrê Rojhilatê Kurdistanê dest pê kir û êdî fersenda domandina xwandinê ji min re nema.

Di xilasiya sala 1979'an û destpêka 1980'an de bi alfkariya Mihendiz Cangîr Îsamîlzade ku peywendî digel PDKÎ û Şehîd Dr. Qasimlo re hebû, digel çend hevalên Şîmalê wek Şehîd Elî Kaşîfûr, Mizefer Begzade, birayê min Arşad Muradî, Şapûr, Hisên, Niho û wd... me yekemîn rêxistinên PDKÎ li Bakûrê Rojhilatê Kurdistanê ava kir û xebata me ya siyasî û çekdarî karê xwe dest pê kir û di hemû deverên herêmê de deng veda.

Ez heta xilasiya salên 1985'an di nav refên PDKÎ de, di beşên cur be cur de çalak bûm, di despêka sala 1985'an de ji ber rewş û zirûfa wê demê ez li Kurdistanê derketim û ser min li ser Swêdê hasilî.

Ez îro li Swêdê wek bernamerêjê kompyuterê bi zimanê Cobol-86 li şirketek berfirih a Skandînavyayê de bi navê Nordea di beşa navneteweyî ya wê de kar dikim û li kêleka wê jî karê xwe yê civakî û siyasî jî dimeşînim. Niha berpîrsê giştî yê CAPK me.

-Kek Têmûr, Çima navê Civaka Aştî û



CAPK'Ê DIXWAZE BONA XURTKIRINA LOBÎYA KURD Û PÎRSÊN KURDISTANÎ DENGÊ XWE BÎDE BÎHÎSTANDIN

Pêşveçûna Kurdistanê?

Têmûr. M: Nav wek silonek balkêş merem û armancên her saziyekê dide xuyakirin, ji ber ku CAPK li ser wê baweriyê ye ku di Rojhilatê Kurdistanê de xebat ji bo civakek aştîyane û pêngavavêtin ji bo pêşvebirina civakê erkeke herî giring yê navê Civaka Aştî û Pêşveçûna Kurdistanê baş hatiye dîtin û hîlbijartin.

-Armancên we ji bo avakirina CAPK çi bûn?

Têmûr. M: Bersîva vê pîrsê dikare gellek dirêj be, lê ez bi kurtî dikaribim bibêjim ku guhertinên îro yê li ser rewşa civakî û siyasî û hebûna şerê çekarî yê bi salan li Rojhilatê Kurdistanê û bandora wan şeran li ser civakê û paşdemayîna civaka sivil û sedemên din ên cur be cur ji aliyê din jî derfetên îhtimalî û xeterên li ser rêya gelê kurd, pêwîstiya damezirandina CAPK bûn.

Dikarim bibêjim ku armancên CAPK serederîkirina bi wan lêger û pîrsgerêkên civakî û siyasî re ye yê ku di nav civaka Kurd di Rojhilatê Kurdistanê de ne, ev armanc dikarin bi xalên wek pêşdebirin û xurtkirina kultûrek bilind, pêşvebirina edebiyata kurdî, çand û nasnameya neteweyî li Rojhilatê Kurdistanê bêne pênasakirin, her wisa pêxistinîna pîvanên mirovatiyê û mafê mirovan, bihêzkirina bingeha parastina aştî û bi hev re jiyana aştîyane di navbera gelan û civakan de û têkoşîna çalak li dijî dîtinên şaş li ser jinên kurd û xebat ji bo civakek ku mafên mîr û jinan wek hev bibîne.

Xebat ji bo ku ciwanên kurd rêya xwendin û xwepêgehandinê hîlbijêrin bona gihîştin bi civakek serdemî di pêşerojê de, komkirina hêzên Kurdistanî yê ku li derveyî Kurdistanê dijîn û pêkanîna pîrekê di navbera wan û gel di Rojhilatê Kurdistanê de.

-Sedem çi ne ku hûn dixwazin weke saziyêke civakî û sivil têkoşîna xwe bimeşînin?

Têmûr. M: Partî û hêzên siyasî li Rojhilatê Kurdistanê hene û piraniya ew

kesên ku îro di destpêka tevgera CAPK de beşdar bûne, tevî saziyêke siyasî wek PDKÎ ne û wê partiyê bi hêzeke demokratîk û pêşeng ku xebata siyasî û neteweyî a gelê kurd birêve dibe nas dikin, lewma avakirina saziyêke civakî û sivil wek rêya têkoşîna hatiye pesendkirin.

Civakek sivil li ser van hewcehiyan ku em di Rojhilatê Kurdistanê de dibînin, bizavek îro nine, xebata sivil ji bo tesbîtkirina fikir û bingeheke demokratîkê li civakek serdemî û pêşketî di hemû warên çandî, kultûrî, hişyariya siyasî û civakî de pêngavên hewce ne.

Xalek din ev bû ku îro pîrs kesên kurd ku têkiliyên wan bi partiyên siyasî re tune, ji xebat û çalakiyan dûr ketine û zêde di nav civak û bizavên kurdî de îzole bûne, komele û civakên sivil wek CAPK dikarin van hêzan li dora xwe kom bikin, bêtir wê ku pêwendî bi fikir û dîtinên wan yê siyasî ve bibin.

-Kekê Têmûr, CAPK ser bi tu rêxistin û partiyeke siyasî nine?

Têmûr. M: Keko na, wek saziyêke sivil û serbixwe, dostîni li ser bingeha demokratîkê û rêz û hurmetgirtina hevbeş dirûşma CAPK ye, her wek ku di bername û destûra CAPK hatiye ronkirin, em dixwazin bi hemû partî û hêzên demokrat ên Kurdistanê û bi xasî yê Rojhilatê Kurdistanê re hevkar û hevxebe bin û çalakiyan bimeşînin.

CAPK wek her komele û saziyêke sivil, hêvîdar e ku hêz û partiyên siyasî yê Rojhilatê Kurdistanê vê giranî û hewceyî û dewlemendiya civakên sivil fam bikin û bi wan re hevkar bin.

-Weke xuya ye xebat û çalakiyên we taybet ji bo Rojhilatê Kurdistanê ne, ne wisan e?

Têmûr. M: Ji bo me pîrsên hemû perçên Kurdistanê giring in û em hazir in her dema ku hewcetî hebe û kar destê me bê, beşdarî û alfkariyê bikin.

Lê rast e, em xelk û niştecihê Rojhilatê Kurdistanê ne, pîrsgerêkên Rojhilatê Kurdistanê arîşe û giriftên me ne, CAPK Rojhilatê Kurdistanê û li derveyî welat ev cîyên ku kurd lê dijîn, wek meydana xebata xwe hisab dike.

-Bînpêkirina mafê mirovan li Rojhilatê Kurdistanê ji aliyê Komara Îslamî a Îranê ve bi xurt û berfirehî dimeşe... hûn dixwazin ji bo vê yekê çi bikin?

Têmûr. M: Piştî serkevtina şoreşa gelên Îranê ku bû sebeb rejîma Îslamî desthilatê bigire destê xwe, eva dibe 30 sal ku li hemû Îranê û bi taybet di Rojhilatê Kurdistanê de, mafê mirovan bi awayekî sistematîk, berfireh û eşkere tê pêşvekirin.

Gelê kurd li Rojhilat ji mafên herî destpêkî û mirovî ên xwe bêpar in û di van

30 salan de çî pênasîn bi mafê kurdan yêncivakî, kultûrî û siyasî ên kurdan nehatiyekirin.

Daxwaziyên kurdan bi girtin, zîndan, îşkence, kuştin û zor û zextan têne bersivdan, girtîgehên Komara Îsalmî teji keç û xortên kurd in.

Mehkemeyên Komara Îsalmî a Îranê piçûktirîn usûl û azînen mafê mirovan yêncanûnên navneteweyî berçav nagirin û bi hikmên çend deqîqeyî Kurdan mehkûmî dardanê yan hepsên giran û demdirêjê dikin.

Awayên hovane yêncidaman li Îrane bi daliqandin û kevirbarankirinê her berdewam e, ev rûpelên reş û tarî di dîroka Komara Îsalmî de dê bimînin û nahên jibîrkirin.

Di vê derheqê de, CAPK berpirsiyariya xwe dizane û erk û wezîfeya CAPK ye ku li dijî wan zilm û destdirêjiya li ser mafê mirovan bisekine û ji raya giştî û cîhana navneteweyî re wan kiryar û zordariyan kifş û aşkera bike.

-Helwesta we li ser sazî, komele û civatên sivil, kultûrî û ... ên ne dewletî û serbixwe ku niha li Rojhilatê Kurdistanê dixebitin û bi berdewamî di bin zext û givaşên rejîma Komara Îsalmî jî de ne, çî ye?

Têmur. M: Bi dîtina min eva cihê rûmet û şanaziyê ye ku îro li Rojhilatê Kurdistanê sazî, komele û civatên sivil ava dibin û çalakiyên cuda dimesînin, eva nîşan dide ku êdî Komara Îsalmî bi siyaseta zext û terorê nikare xelkê me bitirsîne û evan mecbûrî bêdengî û pasîvbûnê bike.

Di destpêka şerê sepanî yê Komara Îsalmî bi ser kurdan de, xebat û berxwedana sivil berçav nebûn, lê pêşdeçûna civaka Kurdî û zêdebûna xort û keçên xwandewar ev ekvasyon guhartiyê û îro gel di şert û mercên dijwar de berxwedana sivil dikin, em wek CAPK xêrhatî dibijine wan bizav û tevgeran û pişt wan disekin.

Ev giring e ku bizavên sivil li Rojhilatê Kurdistanê bizanibin ku ev di xebata xwe de tenê nînin û hêzên sivil û siyasî li derveyî welat jî piş serê wan sekinîne.

CAPK dê bibe piştgir û dengê bilind ê wan li derveyî welat û her wisa dê bibe pirek di navbera hêzên li diyaspora û ên hindurî welat de.

-Hûn dixwazin pîlan, piroj û bernameyên xwe çawa û bi rêyan kîjan mekanîzman di nava civaka Kurdistanê de bimeşînin?



Têmur. M: Aşkera ye ku baştirîn xebat û çalakî ev e ku di nav gel û bi gel re bimeşe, hingê ev xebat û çalakî dikare serkevtî be û bibe xwedî bandorek baş di civakê de, lê ji ber ew rewş û şertên ku me di diyaspora de heye, divêt ku em bi awa û rêyên hewce xebata xwe bixin nav dilê gel û hundirê Kurdistanê.

Ciyê kêfxweşiyê ye ku cîhana hemdem û pêşketî a îro ji ber şoreşa medyayê, mekanîzmên baş hene ku dikarin di vî warî de bi mifah bin, CAPK hem dixwaze ji wan mekanîzmên wek internet, televîzyon, kovar û wd... û hem bi çêkirina peywendiyên rasterast bi avakirina sazî û civakan di hundirê Kurdistanê de xebata xwe bimeşîne.

-Hûn weke CAPK tenê li derveyî welat dixebitin an li Kurdistanê jî we dê endam û çalakî hebin?

Têmur. M: Raste CAPK saziyek e ku li derveyî welat karê xwe dest pê kiriye, bêguman xebat û çalakî di nav gel û mil bi milê gel re armanca CAPK ye, lê em di van şertên ku îro tê de dijîn û ev nabe sebeb ku dest li ser destan bêne danîn, em îro li cîhanek nû ku bi lezginî di halê guhertinan de ye dijîn, cîhana îro ji ber sebebên pêşveçûna teknîkî ji aliyê alav û amûrên ragihandinê ve bûye cîhanek piçûk û nêzik, CAPK wek saziyek ji derveyî welat divêt ku ji van guhertinan û alav û amûrên teknîkî alîkariyê werbigire û dengê xwe bigehîne gel û hawara azadîxwaziya gelê kurd jî bigehîne raya navneteweyî.

Em weke CAPK dixwazin bi gelê kurd li Rojhilatê Kurdistanê re peywendiyên berfireh çê bikin û divê CAPK bi komkirina endaman û çêkirina saziyan di Kurdistanê de çalak be, CAPK her wisa weke saziyek sivil dixwaze bibe motora bizav û guhertinan li Rojhilatê Kurdistanê û gelê Rojhilatê di hundir li dora CAPK de kom bikin û çalak bike.

-Piroje û xebatê we ji bo pêşerojê çî ne?

Têmur. M: Eva pîrseke berfireh e, ez dê bersiva we bi kurtî bidim, CAPK saziyek taze û nûvakerî ye, hêj gellek kar û xebat li pêşiya wê hene.

Lê piroje û pîlanên me hene, ya herî gering ev e ku CAPK di nav xwe de li ser pîrs û karên xwe sax be û doktrîna (amozeya) xebata xwe ji dost û endaman re bi awayekî zelal û eşkere daynê meydanê, xalek ku li ser ve vê xebat tê kirin.

CAPK hebûna xwe baştir di cîhana

navteweyî de bide naskirin, dixwaze sazî û çalakî û doktrîna karê xwe wek saziyek sivil li gora şert û mercên NGO (Non-governmental Organization) jyekê bimeşîne.

Em dixwazin CAPK weke saziyek giredayî bi sistema N21 (Network Twenty One International) be ku bikare xwe û pîrsên Rojhilatê Kurdistanê bi awayekî efektîv bide naskirin.

Armanca CAPK ew e ku bikare wek hêza sereke û alahilgirê xebat ji bo mafê mirovan li Rojhilatê Kurdistanê di hemû asta navneteweyî de bê naskirin, ku bikare bona xurtkirina lobiya kurd û pîrsên Kurdistanê dengê xwe bide bihîstandin.

Amadekirin û weşandina raporan li ser rewşa mafê mirovan li Îranê û Kurdistanê û her wisa şopandin û kontrolkirina hemû biryar û kirarên Komara Îsalmî ku wek sûç û tawanên li dijî biryarên Neteweyên Yekgirtî têne dîtin û eşkerekirina wan.

-Mekanîzmên we ji bo çareseriyê pîrsa Kurd çî ne û banga we ji bo degehên însanî û demokratîk ên navneteweyî di vê derbarê de çî ye?

Têmur. M: Xebat û berxwedana gelê kurd li hemû perçên Kurdistanê bi salan e ku dimeşe, îro ev xebata ji ber şert û mercên civakî û cîhanî di qonaxê nû de ye.

Xebat û berxwedana gelê kurd divê ku di hemû warên siyasî û civakî de bê xurtkirin, lê li kêleka xebatên siyasî û neteweyî, em îro giraniyek mezin didin xebata sivil û civakî, ew jî ji ber vê çendê ye ku em li ser vê bawerê ne ku heta civak di warê kultûrî, aborî, zanista siyasî û civakî, çanda demokrasiyê de dewlemend nebe, civakek demokratîk û tenah nikare ava be û bingeh bigire.

Dîrok û temenê bizav û tevgerên sivil û medenî di Rojhilata Navîn bi taybet û nemaze li Rojhilatê Kurdistanê de pîr kin û genc e.


Demokratîkbûn û pêşveçûna civakên Ewropî ên modern û hemdem bersiva ron û zelal a vê hindê ye ku wan herî zêde di sedsalên 17 û 18'an de karê sivil û medenî dest pê kirin û civata xwe di vî warî de xurt kirin. Ciwanbûna temenê navincî yê civaka kurd û zêdebûna jiyana şaristanî û her wisa pêşveçûna pileyên perwerde û xwandewariyê hewceyî û îmkânên berfireh in ji bo avakirin û xurtkirina civakên sivil, ev komele û civakên sivil ku di nav gel de serî hildidin û bi armanca rêxistin û organîzekirina gel û beşdariya wan di jiyana siyasî de xebatê dikin, dibe sedemê civatek xurt û garantiya pêşerojek demokratîk û ewle, her ji ber vê yekê em ji dezgehên însanî û navteweyî û demokratîk daxwazê dikin ku piştgiriyê bizav û tevgerên sivil û medenî bikin û bona xurtkirina wan pêngavan bavejên.

-Sipas kekê Têmur ku we dema xwe ji bo vê hevpeyvîna me veqetand, gotina we ya dawiyê...

Têmur. M: Keko sipas ji bo te û weşana rengîn û delal a Agirî ku we ev derfeta da min, em di kar û xebata we de hêviya

HUNER

ADAR JIYAN
adarjiyan@mynt.com



Huner, pêwendiya navbera mirov û rastîniya tiştêyî ya bedewkar, gewzîn û ciwankar e. Huner,

kirûyeke komelayetî ya ku her gav dibe nîşana perisîna çanda civakî. Huner, narînî, nazikî û ranermî ye. Huner, fehmerî, pêjn û behremendî ye. Huner, hez û hêz, giramî û giranbarî ye. Bi kurtayî huner, çeqa van hemûyan e. Ango huner, zerafeta ferasetê ye.

Jiyan, huner e.

Wekî ku li jorê jî hate diyarkirin huner, xweşikbûn û bedewbûn e. Mirov ancax bi huner û behreyên hunerî re dikare xweşikî û bedewiyên jiyane bidest bixe an biafirîne. Mirov ancax bi rê û navgîniya hunerê û saya berhemên hunerî dikare wateyeke payidar li jiyana xwe ya asayî û rojane bar bike. Mirov ancax bi hest û helwestên hunerane dikare jiyaneke gewzîn û manîdar bi dest bixe. Digel ku gellek gotinên xweş û peyvên şahîk ên ku der barê hunerê de têne/hatine gotin jî dîsa mirov dikare bipirse û bibêje; "Gelo huner çi ye?" Bera huner, tenê çêkirina wêneyekî newaze (harîka) an îstikvaniya şanoyeke navdar e? Berra huner, ristina helbesteke çêjdar û manîdar an avakirina avahiyeke bihişmet û wurşedar (bişatafat) e? Bera huner, karpêka hunermendekî/e dengzîz an sindoqa necarekî tecrubedar e?

Ne jiyan bê huner dibe û ne jî huner bê jiyan. "Owen Merith" dibêje: "Huner xwezayek e, ku ji aliyê mirovan ve hatiye afirandin." Her çiqas mirov wateya hunerê bi çend behre û berhemên berbiçav bide sînardarkirin, an wê bi çend kirû û tîgînên sivik ve girê bide jî, dîsa huner, parçeyek ji jiyana mirov e. Ne mirov dikare bêyî hunerê û ne jî huner dikare bêyî mirov hebûna xwe bidomîne. Carekê her gav ji rabûn û rûniştin, tevger û bizav, sinc û exlaq, tîkilî û ragihandin û hest û ramana mirov, huner difûre. Qesr û qonax, xan û xanî, zanîngeh û perestîşgeh, girtîgeh û nexweşxane, araqgeh û aşxane, kûçe û kolan, gund û bajar, hemû bi ferasetên hunerî ava bûne û hatine lêkirin. Mal û menzel, gor û mezal, hêwan û diwan, kêlik û pêlik, derî û pace; tev bi destê hosteyên hunerker hatine çêkirin.

Merş û xalîçe paldank û sendelî, doşeg û lihêv, rûber û balgî; giş bi destê pişekarên hunerzan hatine dagirtin û

hûnandin. Şal û şapik, cil û berg, kum û koloz, şeml û şewqe, kiras û darî; hemûçik bi sinetkariyeke hunerane hatine ristin û dirûtin.

Her çend ku huner wekî kirûyeke razber an jî karekî nedîtbar bê dîtîn û pejirandin jî, îro mirovahî di demeke hengrî(aqlî), camidî(objektîf) û şênber de dijî. Ji bo wê divê ku her gav mirov, bi ferasetên razberî nêzîkî hunerê nebe. Lewre, linik berhemên girîng û girgîn(berbiçav), mirovan gellek berhemên razber şehyane jî afirandine. Bo nimûne: Zargotin, helbest, stran, zêmar, wêne, sînema, şano, pêkenî...û hwd. Carcaran bi helwesteke çêker, erênî, duristker û rexneyî jî li hunerê binêre û wê bi xweşîdanî binirxîne. Civaka ku bi sermestiyê çavgiştî rabe, hemû cureyên hunerê ji berêv de bipejirîne û bi çavekî rexneyî nêzîkî berhemên hunerî nebe, her gav di xetereyê de ye. Yanê civaka ku nîkaribe huner û hunermendên xwe rexne bike ew nikare berhemên bêhempa û şehyane jî biafirîne. Jixwe huner, rexnekirina xeletî, çewtî û nerastiyên civakî ye.. Her wiha huner, necibandina tiştên heyî an jî ecibandin û firolekirina heyînen demê û bûyerên rojane ye. Huner, destûr nade û nahêle ku tu tişt wekî berê angoyekî xwe bimîne. Car heye huner, tiştan pîr mezin dike, digihîne ber perê asîman û qada negihêjyê. Car heye jî wan bi şewazeke şahîk û gewzîner rexne dike û dadixe bin heft debekê erdê.

Ev yek jî, ji xweza û taybetmendiyên hunerê tê. Heke ku her tişt wekî xwe bimîne an hunermend, bi çavekî rexneyî li tiştan nenêre, wê çaxê ne wateya hunerê û ne jî qîmeta hunermendiyê dimîne. Wekî din jî heke ku bi vî awayî be, ne hewcetî bi behredariya mirov û ne jî bi afirîneriya hunermend dimîne.

Li şûna ku mirov, hunerê di riya dirav û pereyan de bixebitîne, divê pereyan di riya hunerê de xerc bike û bixebitîne. Çi dibe û li ku dibe bila bibe, divê mirov hemû berhemên xwe ji dahatûya mirovahiyê re bike xelat û diyarî.

Belê berî wê jî, divê ku mirov ji dêvla ku bi hunerê re tevê dinê biguherîne, pêşî bikaribe xwe biguherîne û hunerê bixe bin bandora hest û ramana xwe. Lewre jiyan bi xwe huner e. Wekî Jean Poul Richter' jî dibêje: "Huner ne nanê jiyane, şerava wê ye"

Kaniya Helbestan

Bextewerî

Jîla Husênî



Min hewil dida
te binasim
û bidim nasîn
Gopalê hesin di destê min de
kolan, gund û şar neman
li şopa te geriyam
kes nebû navnîşana te bide
min
Min deşt û çol û çiya birrîn
min tu her nedîtî
Min zeryayên xwe
bi henaseyên agirgirtî
kir hilm
û min hîç te nedît
Xembar, westiyayî
dil mişt ji azar
ji xemên hejaran
û birînên laşên birîndaran
Hûr hûr min nêrî
bi min pêkenîn
"bextewerî?!"
ewa ku tu li dû wê digerî
zarokek bû
çawa ji dayik bû
serî birrîn"

Ji pirtûka 'MIRINA ROJÊ' hatiye
wergirtin. Helbestvan Dilşa Yusuf ji
Sorani bo Kurmancî wergernadiye.
Weşanxaneya Avesta

Geriyaneke Di Dîroka Fransayê De Li Ser Yekîtiya Zimên û Yekîtiya



İbrahim Seydo
Aydoğan

Ziman dibe siyaseta dewletî

Di dîroka Fransayê de mijara zimên ji şoreşê û bi şûn ve êdî bû karê

dewletê. Dewleta berî şoreşê rasterast dest nediavêt zimên û gellek ziman û zarava û devok hebûn ku vê yekê, li gora fikrên dema şoreşê, rê li ber yekîtiya dewletê digirt. Biryarên ku di derheqê zimên de dihatin wergirtin jî di nava xelkê de nedihatîn pêkanîn.

Ji ber van sedemên li jorê, di dema şoreşa fransî de desthilatdaran êdî siyaseteke nû li hemberî vê cudabendiya devok û zaravayan birêve bir û jê re got « yekîtiya zimên ». Ji bo vê yekîtiyê jî weha kirin ku devok û zaravayên din bêne jibîrkirin û herkes fêrî zaravayê Parîsê bibe. Wê demê li derdora panzdeh zagonên di derbarê zimên de hatin derxistin ku zaravayê Parîsê jî bilî zimên dewletê, li seranserê Fransayê, bi fermaî bû zimên perwerdehiyê, zimên olê û zimên kulturê.

Soreşê hingê gellek caran ziman û netewebûyîn danîn cem hev û yekîtiya zimên weke şertekî yekîtiya neteweyî nixand. Hingê jî ber ku armanca komara nû û yekpare ew bû ku vê yekîtiyê bi belavkirina zimên fransî ve saz bike. Soreşgeran bi eşkereyî digot ku hiştina zarava û zimên din xaintiya bi welatî re ye û li welatekî azad, ziman divê yek be. Li gora raporeke sala 1794'an, wê demê li Fransayê hê 30 ziman û zarava hebûn ku ji hemûyan re devok dihat gotin. Di nava 83 herêman de bi tenê li 15 herêman fransî hebû.

Nufûsa Fransayê 25 milyon bû, hejmara fransîxêvan jî, gellekî balkêş e ku ji 3 milyon hindiktir bû. Hêjayî gotinê ye ku gava ku digotin « devok », digel zaravayên zimên *oylî*, behsa *bretonî* û *baskî* û zimên din jî dihat kirin û teva van zimanan, hemû zarava jî weke bermayiyên dewra feodaliyê dihatin nixandin ku ew kultura ku îroj jî zimênê cuda re dibêjin « devok » li cem me jî heye. Ji bo çareseriyê pirsgirêka zaravayan jî weha hate pêşniyarkirin ku li her bajar û navçeyan dibistaneke seretayî bê avakirin û li wan dibistanan zimên dewletê yê fermî were perwerdekirin.

Bi vî awayî, di 20'ê Tîrmeha 1794'an de zagonê hate derxistin û bi vê zagonê fransî li ser herkesî hate ferzkirin.

Digel ku demeke kurt bi şûn de ev zagon hate rakirin jî, çar meh bi şûn de

Linguicide An Jî Zimankujî

bi zagonê ve hate destnîşankirin ku « *li seranserê komara Fransayê perwerdehî bi tenê bi zimên fransî divê were kirin* ». Herçî şoreş e, şerrê xwe yê li dijî zarava û zimênê din weke *şerrekî li dijî terorîzma zimânî* bi nav kir û di vî warî de, ne zû bi zû be jî bi ser ket. Lê belê, li gellek deveran, nemaze li Brotanyayê, fransî jî bilî dibistanê nedihat bikaranîn û li malê xelkê hê jî bi zimênê xwe dipeyvîn. Lê, dîsa jî, digel ku ew zimaneke cuda bû, weke zaravayên zimên *oylî*, ev ziman jî hêdî hêdî mişt peyvên fransî bû.

Linguicide an jî kuştina zimanan

Di sala 1831'ê de, Wezîrê Perwerdehiyê, Montalivet, li ser raporeke waliyên herêmên bakurî û herêma Brotanyayê, biryar da ku *şerrê brotoniyê* diwartir bike. Ji ber ku waliyan bal dikîsand ser rastiya xurtiya zimênê malê û digot ku « *divê zimênê brotonî jî holê bê rakirin* ». Hingê Fransayê dest bi *jenosîdeke kulturî* kir û bi biryara waliyê Quimperê ku herêmeke Brotanyayê ye, zarokên ku bi fransî nizanîbûn li dêran di biniya zarokên ku bi fransî dipeyvîn re dihatin girtin.

Waliyên herêmên bakur û çigirên wan digot ku « *yekem armanca dibistanan ew e ku zimênê brotonî bikujin* ». Di sedsala 19'an de, li gora raporeke sala 1863'an, di nava Fransaya ku nifûsa wê bibû 38 milyon de, bi tenê 7.5 milyon kesên ku bi *zimanê neteweyî* nizanîbûn mabûn. Hingê êdî li dibistanan di dema bêhnvedanê de jî brotonî hate qedexekirin. Brotonî di vê mijarê de mînaka herî xurt e. Lewre, gava ku mirov *yekîtiya zimânî* bide ber xwe, mirov zimênê din û zaravayên zimênê xwe jî hevdu cuda nake. Hingê mirov dikare bi hêsanî fahm bike ku qedera hemû zimênê *okî* (oc) yê başûrê Fransayê ku heta dema dawîn jî li hin gundan mabû û brotoniya ku îroj bi tenê jî aliye kal û pîran ve tê zanîn û herweha qedera zimênê *oylî* (œil) yê weke Picardî û Normandî her yek bû.

Di sala 1925'an de Wezîrê Perwerdehiyê Anatole de Maunzie weke pêşengê xwe dîsa pêşniyar kir ku « *ji bo yekîtiya zimânî divê brotonî jî holê rabe* ». Hingê heta salên heftêyî jî li Brotanyayê li ser dîwarên avahiyên fermî peyvên mîna « **Tûkirina**

erdê û axavtina bi brotonî qedexe ye » û li herêmên ziman û zaravayên din jî digot « **xwe paqij bikin û bi fransî bipeyvîn** » ku ev awayê helwêsta li hember zimanan li Turkiyeyê cem Kurdan jî baş tê naskirin. Ev helwêsta fermî di nava xelkê de jî belav dibû û li Parîsê li taxa Montparnasse'ê li ser deriyê bar û qahweyan dihat nivîsandin ku « **kûçik û**

Beşa 3 û dawî

brotonî nikarin bikevin hindur ».

Digel vê jenosîda zimânî ku jê re « *linguicide* » tê gotin, bi zagonên Yekîtiya Ewropayê ve ziman û zaravayên ku Fransayê şerrê wan dikir, êdî jî nû ve derketin holê. Lê belê kesên ku bi van zimanan dizanî êdî ewqasî kêmtir bûne ku fêrbûyîn an jî perwerdehiya wan zimanan, zêde bala xelkê nakişîne, lewre bazara wê nemaye û bi tenê kesên temenmezî pê dizanin. Nuha jî kesên ku temenê wan zêdeyî 60'î ne belkî bikarin brotonî fahm bikin, lê pîrraniya wan nikarin ji bilî çend peyvên bi brotonî bipeyvîn.

Heman rewş li cem Baskî (basque) û Korsiyân (Corse) jî heye. Îroj, bi brotonî û korsî dibistan jî hene û dewlet alîkariya bikaranîna wan jî dike. Tabelayên trafikê li Brotanyayê bi du zimanan li bin hev tên nivîsandin, navên avahiyên fermî bi herdu zimanan jî tên nivîsandin, navên bajaran yê brotonî jî li ser panoyên deriyên bajaran tên nivîsandin. Mirov di cih de fahm dike ku herkesî fahm kiriye ku ew siyaseta çewt bû.

Îroj gelo em dikarin ji vê tecrobeya Fransayê û desthilatdariya zimênê fransî ya li ser ziman û zaravayên din destkevtî bibin ?

Li Ewropaya ku heman politîka lê hate meşandin, îroj biryar e ku rêz jî ziman û zaravayên din re were girtin, lewre ew êdî weke dewlemendiya Ewropayê têne hesibandin.

Erê, li pîrraniya welatan zimênê desthilatdaran weke zimênê fermî yê yekîtiya neteweyî li ser xelkê hate selimandin.

Fransayê bi xwe jî dev ji vê siyaseta xwe berda û îroj siyaseta dema berê rexne dike.

Ev siyaseta nû, ne bi tenê li Fransayê, li welatên mîna Australya û Kanadayê jî êdî dibe kultura rêzgirtina zimanan. Weke ku tê zanîn, Kanadayê, ji ber siyaseta xwe ya asimilasyonê, havîna bihurî lêborîn ji binecîhan xwast. Herweha, Australyayê jî meha Şibatê ji ber heman sedemê lêborîn ji aborîjanan xwastibû.

Zimênê Kurdan, digel ku heman siyaseta li dijî wî hate pêkanîn jî, îroj hê wenda nebûye. Rojekê dibe ku lêborîn ji wan jî bê xwastin.

Kurd îroj li beşekî welatê xwe xwedî desthilat in jî. Lê gava ku mirov lê dinêre, em dibînin ku di nava Kurdên Başûr bi xwe de jî nîqaşeke linguicidê heye û encamên xeternak dikarin ji vî şerrî derkevin.

Heger em vegeerî destpêka vê siyaseta

ku me di dîroka Fransayê de behsa wê kir, em ê bibînin ku Fransiyên, erê dewra

feodalîyê bû, lê belê berî ku behsa yekîtiya zimanî bikin, yekîtiya axa xwe ava kir. Îroj heger em bixwazin heman siyaseta bikin, divê em kurmançî, soranî an jî zazakî û hewramaniyê û devok û zaravayên din qedexeyê bikin û yekê ji nava wan hilbijêrin.

Heger em li gora hejmara Kurdan binîherin, divê em ji bilî kurmançiyê, hemû zaravayên din qedexeyê bikin, û pê nesekinin, hemû zimanên din jî qedexeyê bikin.

Heger em li bikaranîna zaravayê desthilatdariyê binîherin, divê em ji bilî soraniyê, hemû zaravayên din qedexeyê bikin.

Erê, em jî dikarin weke Fransî, Kanadî û Australî û Turk û Ereban bikin. Em jî dikarin ziman û devok û zaravayan qedexeyê bikin.

Lê qedexekirin kuştina zaraveyekê ye û ev kuştin dê encamên nebaş di nava Kurdan de ava bikin ku yek ji wan « rêlbergirtina yekîtiya neteweyî » ye.

Lewre dînamîkên dîrokî û civakî yê dema ku ev siyaseta derket holê û yê nuha ne weke hevdu ne. Karê zimannas ne ew e ku lê bigerin bê mirov çawa dikare gellek zaravayan û zimanan bi hevdu re bide jiyandin.

Ev kar yê desthilatdariyê ye û ew bi xwe biryarê didin. Ji bo ku sibehê Kurd jî weke Fransî û Kanadî û Australîyan li xwe poşman nebin, divê ew bikarin van zaravayan li hevdu binin ku bikarin bi hev re bijîn. Du zarava bin an jî du zimanên cuda bin jî, Kurd dikarin rêyeke bihevreyî pêdayê bikin. Nebûna yekîtiya zimanî, di nava Kurdên soran, kurmanç, zaza û hewraman de, ne li dijî yekîtiya neteweyî ye. Ji bo vê jî mînak gellek in, weke Amerîkaya ku zimanê wê yê fermî di destûra wê de nehatiye diyarkirin, weke Beljîka û weke Swîsraya ku gellek ziman tê de bi hev re dijîn. Yê Kurdan ne ziman e jî, lê zarava ne. Heger Kurd çareyeke baş peyda nekin, ew ê tovên cudabendiyê tim di nava xwe de vehewînin.

Zimannas û lêkolîner bi tenê rewşên zimên şirove dikin, ew ne siyasatmedar in...Lê belê, li ser têbîniyên wan siyaseta jî dikare were avakirin. Heger ev têbînî çewt bin, hingê siyaseta jî dikare bikeve nava çewtiyên dîrokî ku vegeer jê tune.

Poşmanî ne çareserîya pîrsgirêkan e. Ji ber wê ye ku Turkiyeyê li hember siyaseta Yekîtiya Ewropayê serî tewand û qedexeya zimanan rakir jî, hê jî nikare Kurdên bakurî qane bike.

Çavkaniyê lêkolînê di arşîva Agirî de ne

HELBESTVAN Û TÊKOŞERÊ KURD MIHEMED NÛRÎ JÎ ÇÛ SER DILOVANIYA XWE!..

MIHEMED NÛRÎ(ETRÎ GILOLLANÎ) (1927-19.01.2009)




A. Balî

Mihemed Nûrî li Kurdistana Rohhilat li Gilollana Xwarê li devera Gewurka ya ser

bi Mehabadê di sala 1927'an de ji dayîka xwe bûye. Li cem bavê xwe xwendina xwe pêş de biriyê. Di xortaniya xwe de di nav şervanên azadiya Kurdistanê de cî digire. Ewqas sal peşmergetî û siyasatmedariyê de emrê xwe yê 82 salan diborîne. Di roja 19.01.2009'an de, ew Pêşmergeyê Komara Kurdistanê, kesayetî û helbestvanê welatparêz, Mihemed Nûrî piştî heyamek nexweşiyê li bajarê Bokanê koça dawiyê kir. Di gundê "Girdî Qebran" de hate binax kirin. Mihemed Nûrî hevbirê Pêşewa Qazî Mihamed, dostê helbestvanên navdar Hejar, Hêmin, Awat û Heqîqî bûye. Ew di sala 1943-1944'an de bûye endamê J.K. „Komeley Jiyandinewey Kurdistan" û endamê Hizba Demokrat ya Kurdistana Îranê li serdemê Qazî Mihamed. Di Komelê de nazavê xwe "Etrî Gilollanî" wergirtiye.

Di wê demê de Mihemed Nûrî di nav helbestvanên serhildan û rapera Kurdistana de, ew jî mîna Hejar, Hêmin, Awat û Heqîqî dihat nasîn.

Lê di wan ew salên dawî de helbestvanê mezin bi jiyaneke awerte, di nav bêdengiyê de dijiya. Ew xwediyê çend dîwanên helbestan e. Çi Mixabin helbestên wê di nav gel de bi baş nehatine çap û belavkirin. Wî gellek gotarên xwe di Kovara Sirwe, Mehabad û çendîn kovar û rojnameyên din yê Kurdistana Îraqê de weşandine. Mihemed Nûrî di dema hukumeta Pehlewî ya Îranê de, di Parlemanê de qasî demekê, Parmenterê bajarê



Bokanê bûye.

Di sala 2006'an de cara yekemîn helbestên wî weke pirtûk li aliyê Binkey Jînê li Silêmaniyê li Kurdistana Îraqê bi navê "Şewêk û Xewnêk Bistûy Jiyan" hatiye çapkirin. Helbesta "Le ser Bistûy Jiyan" yek ji nimûneyên hêja ya helbestên Kurdî ye. Ji bêtî helbestan bi şehadeta nivîsê wî di "Şewêk û Xewnêk" de mamoste pexşana şewezara Kurdiya Navîne jî, di pirtûkê de bêtî helbestan, serpêhatiyên xwe jî, têda nivîsandine.

Ew di helbesteka xwe ya li ser Komara Kurdistanê û li ser Pêşewa Qazî Mihamed ya ku di wî serdemî de, di rojanmeya "Gowarî Kurdistan"ê de belav kirî de, Mihemed Nûrî wusa dibêje:

Rojî bedbextî xilas bû, bextî (ême) hatewe,
Tîşkî serbestî wêderxist hate şax û zerdew
YA WETEN YA MIRDIN!..

Barî estoy dujmine wa hêsi kirdo gerdinim
Namewê ew jîne talle ya weten ya mirdinim
Ey weten lew wextewe em roleyet xistote rro
Şîrî to kewtote yad u mêhrî toy girtote xo
Dil be sazî to be keyfe rû be xoşî rûyî to
Pê m gutî : debme bellagerdanî to bê hiç dîro
Wextî îcray qewlime obal be textî gerdinim
Namewê ew jîne talle ya weten ya mirdinim
Dujminî bedxû eger to bimdeyey zêrrî wullat
Dar u berd u xak u xollim bo bikeyete haslat
Bimkeye serdarî dinya tacî şahîm key xellat
Şerte têt helldem le tacit bigeyenme rojhellat
Çon debê mehkûmî to bim keç bikem bot gerdinim
Namewê ew jîne talle ya weten ya mirdinim
Lawekan ger ruh fidaken bo weten hêsta keme
Ger bida awî heyatê dujminî, jehre, xeme
Xoşe derdêki ke dakî nîştîmanî merheme
Sîngkem qelxanî toye ey weten pêşmerge
Jiyani min qurbanî to bê ca billînde gerdinim
Namewê ew jîne talle ya weten ya mirdinim
Xem mexo dakî weten, towî miradit şîn eka
Lawî to serxoşe ewro pakî daway jîn eka
Daxî ballay sewzî toye dujminî her şîn eka
Tîni zullmî konî toye qelbî min pir kîn eka
Namewê jêrdestî dujmin bête toqî gerdinim
Namewê ew jîne taile ya weten ya mirdinim
Hazirim bo hîfzî aw u xakeket ey nîştîman
Şerte bîrêjim le ber pê, xwênî geş ruhî rewan
Xwênêkem bo to hellale, malîşm, her dûkiyan
Za debê hiçyan nebin ya dujminî hiçkamiyan
Deçme ber meydanî dujmin ca hellall ke gerdinim
Namewê ew jîne talle ya weten ya mirdinim
Ey weten ger jîn hebê, heqqe ke to jînî minî
Namewê seyri gullistan to ke perjînî minî
Awrim bo hêzî dujmin çunke to tîni minî
Qîbilekem, îmanekem, peymanekem, dîni minî
Ger butî zînar ebestim bibye xaçî gerdinim
Namewê ew jîne talle ya weten ya mirdinim

(Le jimarey 3-î Gowarî Kurdistan le salî 1946 an da çapkirawe. Ew şê're le kobûnewekanî Komeley Jiyanî Kurd „J.K." da xwêndrawe Têbînî: Ji bo alkariya Hesenê Qazî spas dikim.



Çalakekî Din Yê Siyasî Yê Kurd Bi Cezayê Îdamê Hate Mehkûmkirin

► Komeleya Çalakên Mafê Mirovan li Îranê ragihand, çalakekî din yê siyasî yê Kurd bi navê **Êhsan Fetahiyan**, xelkê bajarê Kirmaşanê,



bi cezayê Îdamê hate mehkûmkirin.

Navhatî di Tîrmeha 2008'an de li bajarê Kamyaranê, ji aliyê hêzên Ewlekariyê ve hate binçavkirin û di berrava 22.10.2008'an de, ji aliyê Dadgeha Şoreşa bajarê Sine ve bi 10 sal cezayê zîndanê û dûrxistin ji bo girtîgeha Ramhurmuza Xozistanê, hate mehkûmkirin ku piştî nîşandana nerazîbûnê, dosyaya wî bo Dadgeha Pêdeçûna Parêzgeha Kurdistanê hate şandin.

Dadgeha Pêdeçûna Parêzgeha Kurdistanê piştî pêdeçûn bi dosyaya Êhsan Fetahiyan, navhatî bi buxtana endamêti di yek ji partiyên Kurd yê dijî rejîmê de û li gor mada 186'an a cezayê Îslamî, bi cezayê îdamê mehkûm kir.

Hebûna parêzer ji bo navhatî û awayê pêdeçûn bi buxtana wî hêj ne rohn e.

Rêxistina Mucahidîn Xelqê Îranê Ji Lîstaya Rêxistinên Terorîst Ya YE Hate Derxistin

► Yekîtiya Ewropayê Rêxistina Mucahidîn Xelqê Îranê ku hêzeke Opozîsyona Îranê ye, ji lîsteya xwe ya "Rêxistinên Terorîst" derxist. Çavdêrên Siyasî li ser vê bawerê ne ku ew biryare dê pêwendiyên navbera Îran û welatên Ewropayê aloz

bike. Di yekemîn helwestê de, rejîma Îslamî a Îranê li hember vê biryarê bi tundî rexne ji YE girt.

Hêjayî gotinê ye, ev cara yekemîn e YE rêxistinekê ji lîsteya terorê derdixe ku berê weke terorîst nas kiribe.

Fransa li dijî vê biryarê derket.



Konferansek Neteweyî Li Herêma Kurdistanê Pêk Tê

► Sala borî qirar bû konferansek neteweyî li Herêma Kurdistanê bi beşdariya partî, rêxistin û siyasetsvan



kesayetiyan siyasî yê kurd ên her 4 parçeyan pêk bê. Di sala 2008'an de, ev konferans pêk nehat!

Lê pêkhatina wê konferansê careke din bû mijara medya û çapemeniya kurdî. Li gora hinek agahdariyan, qirar e di sala 2009'an de, konferansek neteweyî li bajarê Hewlêrê bê lidarxistin. Tê gotin ji çar beşên Kurdistanê, partiyên siyasî yê kurd, kesayeti û siyasetsvanên kurd dê beşdar bibin. Bedevkê Serokê Herêma Kurdistanê, Dr. Fuad Husên ev yek erê kir ku konferansa han dê were lidarxistin û dê kurd pirsên têkildar bi doza kurd li her çar parçeyan nîqaş û gotûbjê bikin û li ser rêyên demokratîk ên çareseriyê nabiwestin.

Girîngiya vê konferansê eva dibe ku bo cara yekemîn, li ser axa Herêma Kurdistanê pêk tê.

Li Parlemana Ewropayê Konferansek Li Ser Pirsra Kurd Li Turkiyê Hate Lidaxistin

► Bi dirûşma 'Roj roja guhertinan li Turkiyê ye', 5'mîn Konferansa dezgeha navneteweyî a "EUTCC"yê roja 29'ê Çileyê Paşîn a 2009'an, li Parlamentoya Yekîtiya



Ewropayê li welatê Beljîkayê hate lidarxistin.

Konferansa bi axavtina Leyla Zan dest pê kir. Di konferansa îsal de, gellek Parlamenterên Ewropî, siyasetsvan û kesayetiyanê Kurd ji her çar parçeyên Kurdistanê û çalakên mafê Mirovan beşdarî kirin.

Di roja yekem a Konferansê de, Leyla Zan axavtinek balkêş kir û bal kişand ser têkoşîna demokrasiyê li Turkiyê. Zana got, ji bo çareserkiriyek demokratîk hewce ye ku mafên bingehîn ên Kurdan li Turkiyê bê berçavgirtin.

Di roja yekem a Konferansê de, Ehmed Turk, Serokê DTP'ê û Osman Baydemir, Şaredarê Amedê jî axivîn û bal kişandin ser rewşa Kurdan li Turkiyê û pirsgrîkên Kurdan û rêyên çareseriyê demokratîk û aştiyane a doza Kurd.

Beşdariya kesên pirspar û zana weke Madam Mîtran, "Noam Chamsky", Yaşar Kemal, "Bianca Jagger", Şîrîn Ebdalî û ... xaleke berbiçav a Konferansê bû.